

DUGIR

Her sê mehan carekê derdikeve • payîza 1997an hejmar





Xwedî
Kawa förlag

Berpirsiyarê giştî
Dr. Saïd Mele

Birêvebirên kovarê
Ehmedê Huseynî
Zagrosê Hajo
Yihyayê Yûsif

Berpirsiyarê hunerî
S. Rêzani

Abonetiya salekê
200 SKR
Navnîşan
DUGIR Box: 3437
165 23 Hässelby
SWEDEN

Posteya elektroni
Zagros hajo@ avestamail
telia.com internet: w1.
226. Telia.com/~0226
0008

Tel/faks
46(0)8-6211571
46(0)706333261
Postgiro
692357- 7

ISBN: 1400-591

Çap
Çapxaneya APECê

DUGIR

Hejmar 7 Payîza 1997an.

KOVARA KURDÎ LI DERVEYÎ WELÊT
EV KOVAR LI GOR ALFABE, VEKÎT Û

RÊZIMANA
MÎR CELADET BEDIRXANÎ
DERDIKEVE

NAVEROK

- 2 Pêşgotin **DUGIR**
5 Neynikek di şûna semaya êgir de..**HENDRÊN**
9 Heyînek ji pirtikkirî..**YÛSIFÊ CERIHÎ**
10 Sîber..**FEHEDÊ MUSTEFA**
12 Helbestên Hayko..**EBDULREHMAN HUSEYNÎ**
14 Li ser berbi dojeh û ronîkirinê..**ŞÊRÎNA HAJO**
18 Ji dîmenên cenga mezin ..**SEBRÎ BOTANÎ**
24 Dehbelorê..**ÇEXOV.**
26 Qamişlokê..**KEÇA KURD**
28 Çavên te .. **TENGEZARÊ MARÎNÎ**
28 Romyosînî..**YANÎS RÎTSOS**
44 Teraziya xêr û gunehan...**CARL ÇAPEK**
48 Pirtûka ji kevilê xwe der..**E. H. MIHEMED**
51 Payîza temenê min..**ESKERÊ BOYÎK**
52 Wê gundê me xirab bibe..**SULÊMAN ALÎ**
54 Sema, dîlan û govend..**BEŞÎR BOTANÎ**
59 Şarezayên Taristanê..**SELÎM BEREKAT**
69 Dilê yareke bê yar..**MEHMÛD EKO**
70 Birano bes e ..**REZOYÊ OSÊ**
76 Pendên rizyayî yên payîzê..**NEZÎR AKAT**

- Nivîs eger çap ji nebin, li xwedîyan nayên veqerandin.
- Ji bilî naverokê, di serastkirina nivîsan de Dugir azad e.
- Ji bilî nivîsên ko li ser navê Dugirê tên weşandin, her nivîskarek berpirsê naveroka nivîsa xwe ye.

Berpirsiyarê belavkirina kovarê
li Almaniya û Firansayê:
Dr. Mihemed Nûrî Sulêman. TEL: 02303237367

PÊŞGOTIN 1

N oş!!
Bo peyvên ko êdî dest bi kuştinê dikin.
Bo xencera jehrewî.
Bo çepelan

Bo qehremanan.

Bo alên zer û kesk û sor û reş.

Bo berazan.

Bo wî kesê ko vê sibehê bi me re peyivî.

Noş!!

Bo bageran.

Bo wan kesên ko nas kirin û mirin.

Bo zindiyên nezan.

Bo kuçe û kolanên bajêr.

Bo jinên xwefiroş.

Bo wî zilamê ko bûye kûçik.

Bo wî helbestvanê ko helbestan dimîze.

Bo vebîşirîna sexte ya şaristaniyê.

Noş!!

Bo zilamên mezin, pîr mezin.

Bo hêçketina deveyên rojhilat.

Bo çiyayên aramiyê.

Bo salên bendemanê.

Bo matmayînê. Bo çemên girînê.

Bo xewna perşkestî.

Noş!!

Bo herifînê, wêranê, talan û nemanê.

Bo çenteyê reş ê Colin Wilson; çenteyê ko kêrekê xwe tê de veşartibû.

Bo tevliheviyê ko rêbaziya Xwedê ye.

Bo guhê Van Gogh, bexçeyê genim û qijalkan.

Bo çurîsinê, xwewrevînê, bo dudiliya pêwîst.

Bo jibîrkinê.

Bo textê Cemşîd.

Bo taxa Cemşîd.

Bo xelekên zorbaz û hêzdarên mirinê.

Bo sosretê, bo lanetê.

Noş!!

Bo şevistana bi dawîhatinê.
Bo destpêkê, tivingek!!
Noş!!
Bo tivinga kawikî, nezan û xwekuj.
Bo bakur, başûr û rexên bêhiş.
Bo kujdar û qurbanê.
Noooş!!
Bo yên ko bi erzanî hûn firotin.
Bo yên ko li bakurê xwe digeriyan û winda bûn.
Bo yên ko rastî ne ji xwe re û ne jî ji we re gotin.

N oş!!
Bo berbanga rû şewitî ya penagehê.
Bo destên Girê Mozan ko rûpelên zer ên axê bi hespên westiyayî dixemilîne.
Bo çavşînkên Gîrbawî, ko gerokên serdema rizyayî bi lîlandina sînoran dinixumînin.
Bo razên rêzên rêzdarên, bo birêzên nûjeniya ramanê.
Bo lojîka gullebaranê.
Bo sergêjan, sergerdanan, bo berfa dojhê.
Noooş!!
Bo kulîlkên Kurdistanê ko êdî nema dizanin geş bibin, bikenin.
Bo evîna serjêkirî, bo kelaşê vînê, bo nemana çînî.
Bo şîngiriyê, bo konên reşî erebî, bo herçar stûnên derewîn ên pirtûka utopyayê.
Bo roman û dîlan û xwepêşandana şoreşên beravêtî, .
Bo Laleş, bo pasvanê bédengiya şevê.
Bo şeytanên Baudelaire.
Bo Anahîta. Bo têkoşerên şer û revê.
Noş!!
Bo rewşenbîrên bê bîr, dîl û lal.
Bo mîrnişîniya Bedîrxaniyên Stockholma(!) bêpal.
Bo sextekarên peyvê, dizên ji malê.
Bo paytextên çanda nivîskarên şekirfiroş.
Bo pirtûkên ko ti kes wan naxwîne.
Bo aheng û şahiyên derçûna pirtûkên pepûkan.
Bo siyasetmendên ko çavkaniyên wêjeya kurdî şêlû dikin.
Bo projeyên bêkutayî yên çanda bi şûnde mayî (!)
Bo internetê, ko êdî projeyên mezin dê berbi wê ve biçin .
Bo televizyonên ko çelmişîna heyvên çavên dayikên me pêşkêş dikin.
Bo rojnamevanên ko serçavkên me hildiweşînin.

Bo kovarên nûdemiya me ko “hişmendî û felsefeya hejmarê” bi ser birîna zimanê me de dirijînin.

Bo wênayên ciwan û paranoya neynikan.

Bo naverokên zuha û bazirganên ecûr û talikan.

Nooş!!

Bo mirina ko xwe ji bîr dike.

Bo welatê ko hişê xwe dixwe.

Bo miletê ko xwîna xwe bi heskên paşerojê vedixwe.

Bo maçên zuha û bê tam.

Bo rêwiyên ko êdî bîranînan himbêz dikin, û nabêjin.

Bo Praga ko Kafkayî perçeyên wê şêrêz dikir.

Bo Feqiyê Teyran ko Şêxê Senanî di derya evînê de bê melevan hiştiye.

Bo Rimbaud ko destê xwe ji peyv û hestan şuştîye.

Noş!!

Bo serkêşên tiving û pênuşê.

Bo xemxurên dîroka namûsê.

Bo serokên bê partî

Bo partiyên serok.

Bo serokên bê qublename

Bo pêşmergê sed sala bîst û yekê

Noş!!

Bo desthilatê

Bo keftelefta nîşanên xebatê.

Bo hêzên çêkirina niştiman.

Bo şarezayên qirkirina laşê kurdan.

Noş!!?

Bo KURMANCÎ-yê ko êdî ferhenga kurdî dê simbêlên xwe yên qeytanî babide

Bo Med TV ko xwêya zimanê tirkî û erebî bi ser birîna giyanê me de werdike.

Bo çanda sirgumê!!

Bo nivîskarên sirgumê, lê diçin havîngehên welêt û tîn.

Bo jixwebaweriya vê reş-gergerînekê.

Bo nîfşên ko dê bi ser me de bîn!!

Bo cigareya li xurînî.

Bo vê jiyana bê mizgînî.

Noş!!

Bo sersala we! Bo bînsala we!

Bo berhevkirina perçeyên nalîna ala we!

Neynikek di şûna semaya êgir de

Zimanek, bi vebêjiya hemû bircên demê
Bi peymanên rewrewkên yekem-koçê, te ditevizîne
Û di babelsîska pijiqînê de te dinivîsîne,

Te hildigire û bi
xwe re dibe, di
bênahiyê de te
dinimîne
Ca sergêjahî te bê
ziman nahêle.
Ziyaretên gundan,
werdiyanên
mêjûyekê û
xerîzeya bîranîne
jî di weletekî
xewname de
Stêrkeke bi terî
Bi baskên tem û
mijên wan çiyayên
jinebî, digeriya,
dihate dadan, û
difiriya.

Li wir, çekdarên
qederê bi destên
xwe yên Ehrîmenî
çepera êrîşan li ber
devê leşkerên reşbayekî, vala dikir
Seg jî, li pêş xwedyên xwe,
di mijandîna temeke revyayî de ber bi keviya temeke dîtir ve,
bi devê çiyayên bang dikirin
û di nav gulleyên serkeftinê de dibezîyan û li ser terman dereyîyan.
Ha va ye, xakekî henasesiwar, û êleke bi qelavîska,
Bayekî bawî di laşê me de amas digire.

Ha va ye, nîşkekî zindî, mîrevanê bajarekî, serbazên wî
kefenekî jî dîrokê pars dikin û
digel gorên xwe ber bi dîlîtiyê ve bi rê dikevin.
Elfebaya nefreta êgir di agirdankên malên me de geş dibe.



HENDRÊN

Dostên qurbanê û cîranê nexurî yê nebûnê, em in.
Tabûtên daliqayî, em in.
Ez jî diçim ser dareke avis û bêber û şaxeke kevnare, ji kevir.
Rûtîya min., di tîbûna Harût û Marût de.

di nav siwarên hevalbend, vê
efsaneyê bi nav dike,
Ez balendeyekî bi pê diçim û li
koçrewekê li dawîhatinekê
digeriyam
lê min pêşbîniya sirgomiyekê
dikir.

Dizanim ko mirin ji min û ji
nijada min a ko bi ciwanî
miriye, cegerdartir e,
xilqên xwe li ser poşmaniya
çarenûsa me asê dike.
Di her gaziyekê de destekî sar
hest dikim

lewra di kolanên vê tarawgeha
duta de nikarim bi jiyane re li
hev bêm

Ê min çi ye, ma gernameya
çîroka dijwar dê ji bo min çi
bike

Ma ev hevalê ko di şevan de
nameya xatirxwestinê mîna
niviştokê li ser balgeha min
dihêle,

û bi zembîlên gulstêrên
xelmaşbûyî û bi du keroşkên spî û sava li min vedigere, çi ji min divê.?



Ez wêneya vê avê me
Seravbûyî ber bi rexê dîtir ê pencereya şevê ve diçim.
Li wir nav dabeş dibin,
Dilê jinan wek denên kesk li ser milên wan in
û bi çirîskên zelal ên çavên xwe yên mişt babelisk di rûyê te de
tîqetîqê dikin.
Bi pêşwazî, li ber dergehê bajêr,
bi bédengiya ewrê ko tenhatî ji ronahiya wî dirije, nixumandî me,
Û razê ewr, xwezayek e, di çavên min de berdigire.
Û rengên ewr di min de rehajo ne.

Ez bixwe jî mêvanê ez im!!!

Bi destnivîseke hebûnê

Bi deftereke hêrs

Bi elbomeke guman,

di bexçeyê `edem de dersa ziman digel mezheban dixwînim.

Di dema peyvîna li ser felsefeyê, zarokê di kûrahiya min de ye,
di roavahiye meha tebaxê de kêferatê dike
û berbi dibistanê ve digindire.

Bi tiliyên ji baranê, peyvên
min difrêkîne.

Di hundirê vî bajarê çolistan
de

Destek silavê li nediyariyê dike
Ma gelo oxira vî rêbwarê
comerd e?

Di rojên valahiyê de tenhatiyê
dibînim


Êvariyên, tenhatî carcaran
wek masîgîrêkî nêçîra demê
dike,

û stiran jî hetanî ko çav
bibîne, çawan qeresiyên dixwe
û carina jî bi dengvedana
bîranînan cografayêke
valabûyî
ava dike
ava dike

Û bi lingên ezman rêwîtiya
dengekî

Û li vir, tenê hinarekê û
goşiyêke qeresî li dorava min
dihêle

di bêdengiyê de şê bang



dikin

yeko yeko çirên stûnên asoyê vedimirîn

Şev jî bi helkehelk, bi pêş ve tê û mijankên zemînê dinixumîne

Deng dizingin

Û deng bo peyvê vedigerin.

Awirên çavên me ji temaşekirina firîşteyên mermerî
ên ko ji stûnan dadikevin, westiyên.

Bihîstina me li ber silavên zorbaz, ên bavîtiya daristana dîrokê, xilmaş dibe..
Dilên me, ji wê cama rajûbaz ko bextên hevaltîyê eşkere nake, kul bûn.

Ronahî, çira, di bişkivîna xwe de mit û mat in, digel dara merxê ya xeyalê
dîreqîsin û wê pencereya ko bi ser henasên dîrokê de girtiye, dixapînin.

Dive, di sibehekê de, piyaleke mişt me neya bîrîkirinê bilind bikim,

Dive, bi hêvîbûn, di boşahiyekê de, bi hest evînekê binasim.

Dive, em bi xwe gurzê şirovekirinê ji destê nedîtî, biçêlpînin.

Ew gava windayî di rehên gewriyekê de geş dibe

Ne hema deng e
 Reng e jidayikbûna agahiyekê be
 An janek be li ser xwe dipeyive!?
 Ê wexta ko bi amajeyekê em koçberiyê kuta dikin
 Baweriya rawestanê mîna
 parsekan berzûrî me dibe
 Li wir, li ber hêwanê, keç,
 dismalên xwe bo xortên ko ji
 cengê venegeriyan, diavêjin
 “Xwezka em bê zilam bûna
 xwezka zilamên me qir
 bibûna“



Li ser destekî çandî xwedayê
 xweliyê peyda dibe
 Bi duayên xwe sefera dayika
 min bo buhuştê dudil dike
 Ew kundê xembar
 Ew hemî balendeyên
 sirgombûyî
 Li ser nêrdewanên bajêr ji
 zimanê min ê lal bi rev firiyan.
 Roj nîne ko bi bendemanê,
 kesekî , bi pirtûka vê koçê
 sergerm nekin.
 Ê bi derengî jî, di nav bayekî
 sîs de, peyvên li cîmayî li ser
 elendê berhev dikin
 Payîz jî bi şûşeyên vala, di nav
 çavên zer ên giyan re dizîvire.

Ew werz, çendîn li beramberî peymanên min sersar in
 Ew sal, bi xewna reşnivîsên min çendîn bargiran in
 Ez ê aşna, li xwe ne aşna dibe
 Ê neagahiyek di koçê de wek sirûdên Malldro di dergehên ebediyetê de, di
 wexta noşîna êşê de, bi pêlên şûna ko şûmê dirijînin, kêferatê dike.

Şevêk li bin guhê kûrahiyê dikeve
 û kêrek e devgirtî di zimanê êgir de,
 di agirdankeke nediyar de, xwe radikişîne.
 Rojek e kerr, zemîne ditirsîne
 û bi pirsê cewî, di bersiveke diyar de, hildiçe.
 Ez jî kesek im, ne di efsaneyên bi navkirî ên wêderê de û ne jî di koda
 dastanên nijandî yên wêderê de, dibim neynikek.

Ma dê çi biqewimel?
Ey maka xewnên bi dardekirî
Û heyîna ji pirtikkirî

Ko kinête ez

Li ser lêvên te yên kelbitî,
Qermîçokên rûyê te yê direhayî
Û sînga naperûşkirî
Bi evîneke gurî û gemarokî
Bi kar anîne..!!

Tov-peyvên xwe yên qedexê
Bidaw pêşmalka "Enana" rewayê
Libo libo

bireşînim.

Belkî!

Ji bo xatirê wê
Dilovaniya "Enkî"
Ji wan çavên mijtîn
Du dilopên hesretê..

Lê binuqutîne!!

Da

Careke din zil bide
Û ji nû ve bizê
Şitil helbesta min a gurandî
Bi kuh kêrek zingarokî
Di paşilmîraba "Ereşgîkala" jêrî de.
Hey "Îştara" min!

Qey çend "Temûzan" hêê
di ber te de

Nedir bidim?

Ji jîn û mirinê re.

Heyînek ji pirtikkirî




YÛSIFÊ CERIHÎ

Sîber

Firyal!

Êdî em nema ji ketinê ditirsin
nema ji ber sawa şikestinê dilerizin.



Sîbera qekemîn

Ho Sîaksarê piçûk(1)
Ma rast e lo!?
Ma rast e ko careke dî Sekîsiyan
dest bi êrîşê kirine(2)
De bibêj hey malava!
Dako em hespên bagerê amade
bikin
Aniha em berbi esman ve
hildikişin
Dako em mîna keriyeke stêran
bi rê kevin.
Li paş birc û kelehên
Akptanayê jinên ciwan
çavnêrîna me dikin(3)
Ferawtîs li şunwaran digere, de
ka em herin malava!(4)
De ka em herin êdî ji aniha û pê
ve dê şev nemînin.
Û tu jî

Eger tu bixwazî êrîşî dijminê
xwe bikî
Hîmê mezin hilgire
û ji ti kesî re nebêje
Ko kew birayê xwe dikuje.

Sîbera helbestvan

Tu yê çawan aniha dest bi
stiranan bikî birako!?
Û tu yê bi kîjan xencera cehrewî
bejna têkçûnê bipîvî!?
Tu yê çawan bikaribî bi herdû
milên xwe yên piçûk
tawanbariya cîhanê hilgirî!?
" Yê ko zimanê çeman bizanibe,
nezan e
Yê bi sibeheke şîn re qehwê
vexwe, nezan e

*Yê ko bi helbestekê qulqulkî
bibe, nezan e*

*Yê ko avjeniyê di çavên jinekê
de bike, nezan e”*

Daristan ji sînga te direve

Payîz li wir e

Û li vir... Di nivê dil de

nermebaranan ji çavan dibarîne

Û tu bi şînîyan şilbûyî vedigerî,

Û gerek jî tu bizanibî ko tu

helbestekê nanivîsînî

Lê belê tu zilam î

Zilamekî ko dinale û diêşe.

Sîbera bakurê ko ji

ser hişê xwe diçe

Bi xemgîniyan nixunandî
Bîncîkyayî, tu li sîbera xwe
ya ko tu winda dikî, digerî
Gerek te kêleka Şîlardî birîndar
kiriba

Dako te bakur bi romansiyeta
rengan binixumanda

Ew jî li wir bû.. Û li vir...

Jê we ye ko ber bi ezman ve

hilkişîn ji wir dest pê dike

Di nav lingên wê de. Yan di bin
lingên wê de

Û te ji bîr kiribû ko bapîrê te di
vê derê re buhuriye

Û bi xemgînî, bi dudilî di vê
koşeyê de rûniştibû

Di navbera Aras û Xabûr de

Pêlavine zer, kesk, qehweyî, sor

Sirûdên berazan vedirşin

Sîaksar got:

Dem hatiye ko rûbar tiştên te
berhev bikin

Xemgîn nebe!

Dem hatiye ko darên daristanê

tenê ji boyî çavên te bistirên

Tenê ji boyî çavên te

Dem hatiye ko yasemînên şamê

rengên xwe ji ceografya dilê te

wergirin

Û gotin:

Asyayê bendewariya te dike

Dako tu serkêşiya karwanê

hilkişînê bikî

Netirse

Rûbar û dar û felsefeya gîhayan

digel te ne

Û gotin:

Bajar rengê te werdigire

Ma kes heye ko vê kêrê di sînga

min de daçikîne!??

Ma Meryem Xan`ek heye ey

Şîlardiyê heyvê(5)

Ma pir hene dako em berbi

çakiya bejêr ve herin

Û... Û... Ma ti bajar heye?.

(1) Şahê mîdiyan ê ko Babilê dagîr kirbû.

(2) Mîletek e ji Sîbiryayê hatibûn û di
wexta ko

mîdiyan Babil dorpêçkiribûn, Mîdiya
dagîr kirin.

(3) Paytextê
Mîdyayê bû.

(4) Bavê
Sîaksar e,

(5) Li cem
Horiyan

Xwedayê heyvê
bû



FEHEDE MUSTEFA

HELBESTÊN HAYKO



1
Qûm di lingan de
Û di dil de stiranên hehecîkan
Yê evîndar bi rê dikeve.

2
Nexwe ez dê te ji balendeyên
biyanî
û ji şûnewaran re bihêlim
Ez dê te di êşên seqem û
bêrîkirinê de bihêlim
Te dihêlim.

3
Di dûrahiyê de; rengê wê kesk e
Dûrahiya ko rojekê ji rojan
bager durust kiribû
Û rojekê ji rojan jî
Ew dûrahî mîna bagerê, çû.

4
Di navbera bayê gundan de
binavbûyî
Demê zeft dikim
Ronahî jî rê dide min da ko
berbi gavên te yên revyayî de
biçim..

5
Erê erê hey şêxê şîn
Wî pîroz bike
Rûyê wî jî bi stêrkên sivik
şil bike..

6
Neko kin diçe
Lê şikestî.
Neko vemirî diçe
Lê sivik

7
Li vir, em bi hev re rûniştin
Li vir, me lêvên xwe vexistin

Li vir, me cigere bi dijwarî
kişandin
Dûman dibû bajarên koçbariya
me
Koçbariya ko di destê sibê de
dest pê dikir..

8
Li bazaran têra xwe qîriyan û
bi şevê razan
Û wexta ko li ser çira jorîn
navine lerizîn
Vegeriyar malê
Barkirî vegeriyar.
Têra xwe jiyar
Û mîna tayê guhkê şeytên
vekişiyar.

9
Ji gumlekên xwe direvin
Û xwe di nameyan de vedişêrin..

10
Du hesp
şevbuhêrka xwe
Li ber serê êşa min diqedînin..

11
Eva rawestyayî kî ye?
Ew stêrkên çelmişî yên li ser
rûyê te
çî ne?


12
Ma dê çî bi serê van pileyên pir
bê
Eger berbi destê dayika min ve
hilkişin?
Ma dê çî bi serê van pileyên pir
bê

Eger berbi birayê min ve biçin
Ez dê wî himbêz bikim
Min bêriya kurtepeyvên me kiriye
Min bêriya nepoxên zaroktiyê
û pirên bajêr kiriye.

13
Ho qiralê Çînê!
Wek şervanekî
Ji leşkeriya bakur têm.
Hêdî hêdî, serçavka Amûdê
hiltînim
û derbasî demsala defteran
dibim.
Û piço piço derbasî dergêh dibim..

14
Mîna peravan min ji te re distira
Min li dergêhê şîn dixist
Sîbera te dihat
Hîzar û masiyek bi ser min de
avêtin û çû..

15
Ma gelo ez stêrkekê
deynim ser birîna xwe
û razem?!!



EBDULREHMAN HUSEYNÎ

Li SER

'Berbi Dojeh û

Ronîkirinê ve'

YA

Arthur
Rimbaud



Bi rastî ez ji xwe ne behwer im, ka ez çawa dest pê bikim û çilo binivîsim. Ma gelo ez pesnê jiyana Rimbaud a trajîdiyane spehî bidim? Yan jî li ser têgehiştina xwe ya helbestên wî biaxivim, yan jî dibe, ko ka çawa ez bûme behwerpêkera wî. Niyaza min ne ew e jî, ko ez te bi vê nivîsandinê biwestênim, ji ber vê ezê li ber xwe bidim, ko ez li ser tiştên herî girîng binivîsim. De baş e, ezê bi xala pêşî dest pê bikim... Arthur Rimbaud di 20ê cotmehê de ya sala 1854an li Charlevilleya Fransayê xwedê daye. Ew bê bav bi xweh û birayên xwe re û bi diya xwe ya dilhişk re mezin bû. Ew di dibistanê de xwendekarekî gelekî jîr û şehreza û bi bîr û behweriyên xwe pir pêşketî bû. Hê çardeh salî bû xelata helbestnivîsandina bi latînî wergirt. Dema temenê Rimbaud gehabû 16 salan, wî piraniya helbestên xwe yên lîrîkî û herdu 'Nameyên dîdariyê', yên pir bi nav û deng nivîsandibûn. Ew di wan de ronî dike, ka yê helbestvan dive çawa be. Daxwazên wî ji helbestvanan gelekî bilind bûn. Ji nav helbestvanên bêjimar, wî bitenê çendeke hindik xwedî nêrx û xwedî behreya rasteqîne didîtin. Di nav wan helbestvanan de Paul Verlaine, Victor Hugo, Albert Mérat û di dawiyê de, lê ne kêmî wan Charles Baudelaire - helbestvanê pêşerojbîn, şahê helbestvanan, xwedayê rastiyê- cihê xwe digirtin. Rimbaud yek ji hîmdarên, wêya ko em dibêjin, lîteratûra modern e. Ew

bi sed salî li pêşiya dema xwe bû. Ew dema ko tê de bikaranîna keresteyên narkotîka psikedelîkî ketine rewacê, û ew têgehişt, ko dê helwese (halusînasyon) weke şêweyeke afirander were bikaranîn. Jiber ko...“...helbestvan dîtina xwe piştî dudilî û gomanên mezin, û piştî ko pirsê di nav hemû hest û hiş û ramananên xwe re derbas dike û serad, bêjing û moxil dike, piştire ew diafirîne. Ew hemû şêweyên evînê, hejariyê, çewt û şaşîtiyê... kul û derdan, şetî...û piştî êşeke ko nayê pesindan dibîne û bi van tevan ew tê perçiqandin û strihandin, êdî ji nû ve, di wê pileyê de ew di bin fişareke mezin de, têgehiştina hizrên xwe winda dike û hizir dibine rastiya jiyana wî“. Ev beşek ji 'Nameyên dîdariyê' yên Arthur Rimbaud bû. Bi rastî, ew têgehişt ko ji bona afirandinên hunerî ferehkirina bergehên hestan pêwîst e û helbet wî bi xwe jî gelek ezmûneyên sewdanî û lêkerî kirin.

Li malê Rimbaud ne dilxweş bû û vê dihişt, ko ew gelek caran ji malê bireve Parîsê û xwe bavêje nav keftelefta xelkên bohêm, ên li wir dijîn. Car caran ew divegerandine malê, lê wî xwendina xwe berdewam nekir û li şûna xwendinê berê xwe dida meyxaneyan, alkoholê, narkotîkê û jinên arzan. Lê ew ji pirtûkxaneyan jî bidûr nediket. Wî gişt hemû pirtûkên li ser sehrbaziyê, alkemyayê û hemû tiştên din, yên givar û balkêş dixwendin. Di dawiyê de wî bêveger ji malê bazda û çû cem helbestvanê neurotîk Paul Verlaine û li cem bi mal bû. Dihate gotin, ko pêwendiyê nedurist di nav herduyan de hatibû li dar xistin. Ew herdû weke toleyan dijîn û li seranserî Ewropayê digeran. Ew demekê li Londonê man û dîse vegerane Fransayê. Lê di careke ko Verlaine sermest û bi siran ketibû, wî guleyek avête Rimbaud û ew ji milê wî ve birîndar kir. Ji wir û pêde êdî Rimbaud nema qîma xwe anî, ko pêre bijî. Hin dibêjin ko kesayetiya Verlaine kesayetiyeke lawaz bû. Wî xwe bi Rimbaudê deh salan ji xwe piçûktir ve dihilperikand û dixwest, ko xwe pê bilind bike.

Heyama Verlaine kuta bû, Rimbaud careke din vegera malê û li wir dest bi berhema xwe ya pêşî û mezin kir ko bi navê *Une saison en Enfer* (Demek di dojhê de) e. Ligor gotinên diya wî, Rimbaud ew kar 'bi kelogiriyê, bi giriyê şêrîn, bi nalîn, bi tinazok, bi tiqetiqa bilind, bi xeyd, bi torebûn û bi lanetkirinê', bi tenê di bin çatiyê malê de, dikir. Karê mezinî din yê Rimbaud *Illuminations* (Ronîkirin) weke berhema herî şoreşgêr tê jimartin. Dibe ko Rimbaud ew li dora sala 1874an nivîsandibe, dema ko bi helbestvanekî din re bû, yê bi navê German Nouveau. Ew herdû bi hev re di bin çadirekê de dijîn.

Piştî vê Rimbaud xwe ji lîteratûrê dûr xist, an jî, negeha ko careke din

lê vegere. Wî jiyana xwe ya mayî bi ger û koçbûnê derbas kir. Ew li Nems, Holand, Almanya, Danêmark û Swêdê gera . Salên 1878-1879 wî bextê xwe li Qubrisê ceriband, di pey re wî berê xwe da Misrê û li dawiyê ew çû Etyopyayê. Li wir wî ehora xwe bi bazirganiya qehwe, çerm û çekan dikir. Dibêjin jî, ko wî bazirganiya koleyan dikir. Lê wî ev tişt di nameyeke xwe de daye mandelayê, êdî naxwe emê çima li gotinê wî bi şik derkevin û emê wî bi tişteki wilo tawanbar bikin.


Rimbaudê evdal jiyana xwe ya kurt û weke babîsokê di nexweşxaneke li Marseillyê gehande berbi dawiyê. Ew reben, şepirze û bi lingekî jêkirî, di 10ê mijdarê ya sala 1891ê de canê xwe siparte taristana sermedî û laşê xwe siparte axa sar.

Di helbestên pêşî de zimanê Rimbaud, tijî hev guncîna bilind in, vebijartina gotinan bi guman û balkêş in. Pir slang (peyvên tewtewe yên cadan), derbirînên sixêfkî û gotinên nenas bikar dianî. Di pexşana (proza) xwe de *'Demekê di dojhê de'* ya ji neh parçeyan, ko berhemeke bi rastî sergerde ye, ew bi bez xwe ji wêneykî çeng dike wêneyekî din, pêl her bîrsayî û logîkê dike û li şûna wê ew li ser hesteyên xwe yên tev bi kul û derd dinivîse. Şirovekirinên li ser vê berhemê gelek in. Hin wê weke peymana lêborînê ji dema, ko bi Verlaine re bû dibînin û weke xatirxwestina ji lîteratûrê dixwînin. Hin jî dixwazin bibêjin, ko nivîsa wî mukurhatina guhertina hundurî ya *'herî dawî ye, ya ko bi Rimbaud re qewimiye û pê ew berbi sincên gehayî ve diçe'*. Ez bi xwe dibînim, ko ev berhem gelekî xemgîn e û neynika dilşikestî û depresyonên kûr yên giyanê wî ne û reva wî, ya sermedî ji rastiye ye, rastiya, ko nedişiya wê bipejirêne. Dinya jî ne ew dinyaya, ko wî pê behwer kiribû. Ew gelekî reşbîn û hêvîşikestî bûbû û ji hundur ve ew bi kûrayî birîndar bûbû.

'Ronîkirin'a Rimbaud çi ye?

Ez bi xwe, bervajiyê gelek, baş ténagehim, lê ma gelo tégheştin gerek e? Ma pêwîst e, ko mirov wateya her hevokê û gotinekê nas bike? Helbest li ser çi ye, ne ew e tiştê herî giring. Ez behwer dikim, ko tiştê herî sereke ew e, ko her hevok û her gotin bi formeke ko neyê jibîrkirin li hev biguncin û di hişê mirov de bimînin.

Di *'Ronîkirinê'* de ziman bi



awayekî cida hatiye nivîsandin, gelekî bi harmonî ye û geş e. Hin beş pesnê cih û mirovan didin û hin jî serpehatiyên tarî û bi mij û moran dibêjin. Ew weke dûrdîtîninên bêzemîn in.

Her rûmet ji Baudelaire re, lê ez behwer dikim, ko Rimbaud bi çirisandina xwe daye pêşiya wî. Rimbaud weke zarokê wêjeyê yê herî balkêş e. Ew xwediyê behreyeke resen e, ew ferîşteyê ji ezmanan werbûyî ye û ew mamostayê şeytanî ye. Ew weke nîvxwedayekî dihate bilind kirin. Lê ma ka ew çi bû? Mixabin, dema ko ez li ber xwe didim, da bersiva vê pirsê bidim, ez xwe bêçare û bêdesthilat dibînim, lêbelê ez nahêlim, ko hûn bê bersiv ji vir herin.

“ Ez! Ez bi BEHWERÎ BÛM, KO EZ SEHIRBAZ IM, YAN JÎ
EZ FERÎŞT IM, EZ JI HER
ERKÊ MORALÎ AZADKIRÎ ME,
EZ CAREKE DİN BI SER
RÛYÊ ZEMÎNÊ DE
WERBÛME, BI ERKÊ KO EZ
JÎ XWE RE LI ERKEKÎ
BIQERIM Û DA EZ PÊ
RASTIYA KOP Û KULEK
BIPELIXÊNIM Û TERTÛBELA BIKIM”. (ARTHUR RIMBAUD)



JI DÎMENÊN CENGA MEZIN



Duh bû me d'go tu dêw î
Îro tu mayî sêwî

Ser milên te yildiz in
Memûrên te giş diz in

Enwero xwelî sero
Rebeno bê eskero

Van sebavên misqofan
Anîn lêmişt û tofan

Esker mesker tev kuştin
Paşa maşa maliştin

Li çolan wek roviyan
Ji tirsan direviyan

Ramalîn tabor mabor
Çiya kirin xwîna sor

Çawa bi vî eskerî
Te kir şerê Qeyserî

Keko tu ne hember î
Hey paşayê hemşerî

Ji devê Dirbasê Wanî yê şêst salî.
Mûsil sala 1947an

**ŞERÊ SARIQAMÎŞÊ
ENCAM Û VERÊJ**


SEBRÎ BOTANÎ

3

Ev Enwer, Enwer Paşayê bi nav û deng e, serleşker û qumandarê şerê Sarîqamîşê bû. Ev şer, şerekî mezin û pir dijwar bû. Beste jî ya mitirbekî serhedî ye û têde encama wî şerî bi şkestina ordiya tirkî radigehîne. Silêmanê Misto vê carê jî wek her car bi "Hey dinyayê, wey li wan rojên reş, rojên kuştinê, rojên mirinê, birsîbûn û kûtîbûnê, rojên qirkirina ermeniyana, dev bi gotinê kir":

- Pir kesana bîrhatinên xwe, yên wî şerî gotine û ez nizanim ka kê çi gotiye?! Lê herkesî li gor dîtina xwe, belkî jî, kê-m-zêde, li gor hezkirina xwe gotibe. Ez jî, ko di wî şerî de çawîşekî şervan bûm, dixwazim dîtinên xwe ji civatê re bibêjim. Helbet mirov nikare hemû tiştan bizanibe, ençe mirov heke derewan neke, bikaribe ya ko bi çavê xwe dîtîye, bizanibe. Ên dîtîr hemû li ser texmîn û gumanê dimînin.

Di vî şerî de ordiya me ya sisîyê ziyaneke pir mezin xwar. Ev ziyana pir mezin ji her alî ve û di hertîştî re xuya dikir, ko mirov zabitên bêkar û bê esker didît, êdî veşartî nedima. Kuştî û



birîndarên me pir bûn.. Bilî wan kuştî û birîndarên ko li çol û çîyan mabûne bêkes û neguhastî, ji xwe hejmara wan ji rûsan û dehbeyên çolan pêve ti kesî nedizani, çend e? Û bi hezaran neferên me yên wîndî jî hebûn...çi firar, çi dîl û çi jî ew neferên ko xwe ji bo revê

veşartibûn... Hindek ji blokên taboran bêhemdê xwe piştî şkestinê tevlihev bûbûn. Vê yekê kir ko her kes bi serê xwe be, negirêdayî ti kesî yan ti blokê be... Herweha dan û standina wan blokên nîvçe û jihevketî, bi meqamên ser xwe re nemabû, çûnkî telegraf û telegrafçî bêser û şûn bûbûn. Kurt û Kurmancî, em dikarin bibêjin ko tiştêk bi tiştêkî ve girêdayî nemabû. A çûbû çûbû û ya mabû jî şerpilîbû...

Vê rewşê kir ko di serê wê zivistanê de û di wê kulpê de, li hindek deran xurak û erzaq hebe û li hindek deran letek nanê req jî peyda nebe. Lê biqasî ko ew şervanên birsî bi şkestina xwe û bi kuştina hevalên xwe, xemgîn û fihêtkar bûbûn, bêtir ji ewqasî ew bi riswabûn û şepirzebûna wan serleşkerên bêkar û bêleşker, kêfxweş bûbûn. Bi eşkere tinaz û yariyên xwe bi gotina îstixbaratê dikirin ko digot:

Heger zîyanên rûsan di vî şerî de ji yên me ne bêtir bin jî, lê bi her hal ne kêmtir in. Zabitekî ernaotî gote çawîşekî:

-Ka ew xezete? Rojname li kû ye? Ê çawîş bi dengêkî bilind, bêtirs û şerm gotiyê:

- Eîfendim, min qûna xwe pê paqijkir û xwar. Çi gava min xwe vala kir, hingê here bibîne. Hemû binasê yên mîna te bûn, me bi sedan, belkî jî bi hezaran kuştî û birîndar ji bo rûsan û dehbeyên çolan li paş xwe hiştin...

Êvarekê dîsan sêzdeh ji wan zabitên bêkar û bê esker, di ber me re derbas dibûn, me yek tenê nas kir, navê wî Îzzzzz... bû " Li vir Silêmanê Misto ê ko em dikarin ji nuha û paş de navê wî bikin Silêman Çawîş, bi bilêvkirina navê Îzetî re, kenekî bilind û ji dil hatê, rondik ji çavên wî barandin. Êdî tîqetîqa civatê jî odeya teng û piçûk dagirt. Bê ko zanibin bi çi yan li çi dikenin...

- Li min negirin! Silêman Çawîş got. Di şûna ko bigiriyama, vî Îzetî kir ko ez we jî bi xwe re bikenînim, lê hûn dê bibînin ko hemû pêkenînen min ji sitem û zora dewleta romê dipijiqin. Ji çepelî û hovîtiya zabitên wê dipijiqin. Ez naçar im li ser xeslet û kesîtiya vî Îzetî bisekinim û kirinên wî yên pîs û çepel, ko min bi çavên xwe dîtine bi dirêjî bibêjim... Lê di pêş de em binêrin ka piştî şkestina ordiya me ya mezin û tekûz, Enwer Paşayî çi kir, paşê vegerin ser çîroka Îzetî.

Lijneyeke pênckesî bi navê *Enwer Paşayî* hat; mifetişek difinîno, bînbaşiyek, elmanek, yozbaşiyek, sivilekî serpiçûk û simêlmezî, başçawîşek, sê çawîş û şêst nefer

esker jî bi wan re bûn. Berî hertiştî, ew blokên kêma nefer û jihevketî bi lez bi hev ve pînekirin. Û paşê çilpêncî nefer ji vir, heftê-heştê ji wir, sêsed-çarsed ji firarên ko hatibûne girtin û dîsan vegerandibûn, hindêk jî nizanin ji kû anîne û ew kêmasî û valahî pê dagirtin û birin qontar û pesarên du çiyayên pêşberî hev û çepirandin, ko ev jî li gor plana wan, dê bi vî awayî rê li êriş û hatina leşkerê rûsî bigirin û bi xwe ve mijûl bikin û nehêlin derbas bibin. Da hingê ji paş ve taborek eskerê berhevkerî û veşartî, ji nişkê ve êrişî wan bike û tola şerê *Sarıqamîşê* ji wan bistîne. Lê pa rûsan ev êrişê plana *Enwerî* nekirin û dê nekin jî, wek em dê bibînin...

Nuha dor geha çîroka *Îzetî*. Cara pêşî ko min ev *Îzet* dît, wek ez generalekî bibînim. Lê ne tenê min, herkesê ew didît ev texmîn dikir. *Îzet* yozbaşî bû, yozbaşî *Îzet* bi reng û rû mirovekî qenc, nerm û hêmin dixuya. Lê di rastiya xwe de ew hovekî tûj û serhişk bû. Ta neqencî hebwa, wî qencî nedikir. Loma neferên wî yên tirk û laz navê wî kiribûn *Poxbaşî* û yên kurd jî *Mîzbaşî* jê re digotin. Ev *Îzetê* sert û serhişk, di şerî de dinya lê dibû konmişk. Lê di rojên bê şer û xweş de ew ji hemû hevalên xwe şoxtir, derewîntir û ziman dirêjtir bû. Bi her behaneyê , wî xwe digehande neferên ko ew ji wan ve nenas e, mîna derwêşekî sextekar û zimanlûs, bi gotinên qelew û qebe, şîretên dîn û diyanetê li wan dikir û hwd.

Me bawerî bi xwe, bi dîne xwe, bi sultanê xwe û bi dewleta xwe heye, ko em dê van rûsên gawir bişkênin û *Qafqasa* xwe jî, ji wan bistînin... Herkesê dilê wî bi ermenî û êzdiyan bişewite, yan alîkariya wan bike, ew



kuştina xwe helal dike! Ew dergêhê dojêhê ji xwe re, bi destê xwe vedike!

Tawan û gunehên yozbaşî *Îzetî* zaf in û hemû jî mezin in... Rojêkê sê neferên rûsî ko yek ji wan birîndar bûbû, bi dîlîtî ketibûne destê dewrîyeke eskerî de. Piştî guhaztina wan, ew şandibûn cihê komkirina dîl û girtiyên şerî. Lê bextên wan ew ajotin û anîn ber destê vî *Îzetî*. Di şûna ko *Îzet* wan biparêze, yan veguhêze cihekî veder û hêmin, her sê jî cilkirin û wilo bi rûtî- çîpçîplaq- radestî (teslîmî) *Şehabê Mûsilî* û pênc neferên din ji yên xwe kirin, ew birin di kortekê de avêtin û bi dar û keviran kuştin... *Îzet* bi behaneyê ko rûs jî dîl û birîndarên me dikujin, ev her sê kuştin. Lê ti kesî bawerî bi gotina wî nedianî, piraniya neferên li wir jî hev re digotin:

Pa gelo heke rûs pê bihesin em dîlên wan dikujin, nemaze wisa bi hovîtî, dê rewşa dîlên me li cem wan çî be û çawan be?

Lê ne tenê *Îzetî* ev gunehên mezin dikirin! Dihat gotin ko li deverine

din jî zabitên me dîlên cengê dikujin... Ew du roj bûn ez hinavêş û li cem neferên erzaqê li hêviya hatina doxtorî bûm, wek dibêjin bûbûm, 'ciyanê jîjû', ka dê kengê bigehe... Nîvroyekê çawîşek û pênc nefer, ji yên şopgerîne (teqîbatê), pênc zilamên ermenî bi destên paşve girêdayî anîne sparteyî zabitê îdarî *Balîkesirlî* kirin. Yek ji wan ciwanekî 17-18 salî bû, yên din 40-45 salî bûn. Her pênc jî pir hatibûn êşandin. Em, ew neferên ko li wir bûn hemû bi anîna wan guhişîn. Çûnkî piştî şerê *Sarıqamîşê* êdî bêpîrs û bersiv ermenî dikuştin. Pa gelo bo çî evên hanê bi saxîtî anîne?! Ta paşê hat zanîn ko kareke *Balîkesirlî* li ser dozekê bi wan heyê û dê paşê li ser daxwaza istixbaratê her pêncan bişînin *Mûşê* û bispêrin. *Orxanbabasî* zabitê erzaqê, ko mirovekî bêziyan û çavnetirs bû, ta dil dixwaze ew xêrxwaz jî bû. Lê digel vê jî, wî li hertiştî dipîrsî û carnar mayê xwe jî di hindek şolan de dikir, lê bi vajîtî, wî rastiya hertiştî vajî dikir. Heger dinya germ bûya, wî digot:

Ez qerisîm, ev çi sir û seqem e!
 Heger bigota bijî Sultanê me,
 mirov dizanî ew dibêje bimire
 Sultanê me... Hingê, her kesî
 dizanî ko ji mêj ve bû, carekê xelkê
 bajarên mezin bi hev re rabûbûn
 serpiyan û bi deng û hawarên
 bilind gotibûn '*Sultan Reşad*, fisq û
 fesad!' *Orxanbabasî* ev gotina ko
 hingê kevinbûyî û ji bîra herkesî
 çûyî, ji nû ve piştî şerê *Sarîqamîşê*
 bi mehekê, ji neferên xwe re vajî
 kiribû, gotibû 'Gelo kengê dê
 careke din xelkê me bi hev re rabin
 bibêjin, ko *Sultan Reşad*, edalet û
 cihad!

Ji ber vê zimandirêjî û zêdegaviya
 wî, nemaze li gor rewşa wê dem û
 cengê, yekser ew girtibûn. Lê paşê
 min nezani û ti kesî jî nedizani,
 çawan û ji ber çi *Kazim Qere paşayî*
 ew dabû berdani û efo bûbû. Êdî ji
 wê rojê ve tobe kiribû. Wî êdî ne bi
 qencî û ne jî bi xirabî, ne navê
 Sultan û ne jî yê dewletê nediani
 ser zimanê xwe. Lê ko wî ew pênc
 ermenî ji nişkê ve di wê rewşa
 xirab de dîtî, êdî xwe negirt, wek
 kesekî nîvmest û hay ji xwe nemayî
 devê xwe şewitand û tobeya xwe
 şkand:

- Waaay... Hey hawar... Axir
 zeman e! Axir zemaan... Ji ber çi
 wisan hatine hingavtin?... Ey felek çerxa
 Babulaliyê te wergere!... Ey
 xwedayê min, hemû finasê te ye!...
 Heger mirov di şeran de bêne
 kuştin û birîndarkirin, bila, lê bila
 dîl û girtiyan eşkence nekin.
 Xwedayo vê yekê qebûl neke!

Orxanbabasî têra xwe got û vegot,
 paşê ji *Balîkesirlî* pirsî:

- Gelo destûr heye ko ez xwarinekê
 ji wan re bînim?! *Balîkesirlî* ji
 despêkê ve bi awirên kînê li wî

dinerî û bersiva wî jî neda. Êdî
 hema ew pirs ji ermenyan bi xwe
 kir. Lê *Balîkesirlî* nehişt ermenî jî
 bersivê bidinê û bi hêrs gotiyê:

- Te mafê'ê pirskirinê nîne! Ne ji
 min û ne ji wan! Tu zanî? Heger
 îşev serên xwe yên hişk ji wan pilan
 û saluxên genî vala nekin û rastiye
 eşkere nekin, dê hingê xwe
 bibînin!!!

Di vê kêlikê de *Îzet* û neferê xwe yê
 herdemî *Şehabê Mûsilî* mîna du
 cinan ji nişkê ve peydabûn. *Îzet* û
Balîkesirlî bi germî hev hembêz
 kirin û paşê li hember hev qît
 sekinîn û pistepista wan despêkir, lê
 dirêj nekir û *Îzetî* mîna hovekî har
 berbi *Orxanbabasî* ve lezand û hat,
 çav di serî de sor bûbûn. Bi dengêkî
 bilind gotiyê:

- Heydê here gûyê diya xwe ji wan
 re têr bîne û tu jî bi wan re bixwe!
 Heydê zû ji pêş çavê min biqêşite û
 kuştina xwe wek ya ermenyan li me
 helal neke û neke jî ez devê xwe li te
 vekim!!! Cara pêşî me tu dabûyî
 xatirê potîna *Kazim Qerepaşayî*...

Roja paştir hindê neferên li wan
 deran komeke piçûk ji ax û keviran,
 ji dûr ve didîtin û bi tiliyan nîşa
 hevalên xwe dikirin... Pênc term
 perçiqî û destgirêdayî di bin de
 bûn... Hindê lîreyên zêr û
 mecîdiyên zîv, ko ji nêv cil û pêlavên
 wan deranbûn, berîkên *Îzetî* û
Balîkesirlî pê girntir bûbûn. *Şehabê*
Mûsilî jî bi saeta serkîsof a
 ermeniyekî ji wan hatibû xelatkirin
 û zincîra wê ya ji zîvê lihe, bi bedena
 sakoyê wî ve diteyisî... *Orxanbabasî*
 zabitê erzaqê jî xwedê bide, erdî ew
 daqurtand, ezmanî hilkişand!! Ji
Îzetî, *Balîkesirlî* û her sê-çar neferên
Îzetî pêve, ti kesî nedizani. Lê kî
 nabêje ko termê wî, di binê wê
 komika ax û keviran de, ne yê şeşê

bû? Belkî. Lê ya ji hindek zabitan re bûbû xem û xwezî, yozbaşîtiya *Îzetî* bû.

- Gelo ev yozbaşîfî ji çi yan ji kû jê re hatiye? Digotin...

Xwedayo, ne ji devê min, lê pistepisteke ne kurt di nêv zabitan de hebû. Li ser bextê kesê gotibû. Digotin ko berî şerê *Sarîqamîşê* bi mehekê hindek kesên sivil li *Enwer Paşayî* bûbûne mêhvan, ev *Îzetê* bavê xwe jî, yek ji wan bû. Ti kesî ji wan 'Kulile Askerî-Lisesî' belkî bi çav jî nedîtibe, ta dor bigehe xwendina ders û meşqên wê û mercên wê yên dîtir. Lê *Enwer Paşayî* ji cem xwe, û di çadira *Mîralayî* de û li ser daxwaza 'Şêxul-Islam' û yawirekî Sultanî, ev qenciya piçûk li wan kiriye! Sebeb jî ligor texmîna wan ew e, ko madem bijartiyên '*Şêxul-Islam*' in, bêguman pir zîrek û hêja ne.

Ko çîrok ev çîrok be û *Îzet* jî ev *Îzet* be, helbet wî hêsta tiştek nekiriye ko hejî gotinê be. Eva ko 6-Sako: çakêt

ta nuha we bihîstiye serpeşk û dilop in. Heştta lehî negehayê, dê di dema xwe de bigehe. Ez ne bi lez im û hûn jî ta dawîya vê serpehatiya min û pênc ji hevalên min, bêhna xwe li min fireh bikin. Hingê hûn dê bibînin ka ev *Îzetê* bavê xwe, ev qaremanê Sultanî, bi çi mijûl e, çi dîke û dê çi bike jî?! Ji ber ko -bi texmîna xwe- ew jî mîna hevalên xwe, nîşan û xelatên dewleta *Alî Osman* ji xwe re misoger bike...

1-Yildiz: stêr

2-Kulp: xela, birçîtiya tund

3-Poxbaşî: gûbaşî

4-Civanê jîjû: gotineke pêşîyan e, yanî li benda hatina jîjû

5-Lihe: resen, esil

Dil


HELBEST

Dilê ko bi xeman
neyête şuştin
spî, paqij nabe.

Dilê ko bi evînê
neyête avdan
şîn, geş nabe.
Dilê ko evînê
belav neke
ne dil e,
kavil e.

Evîna te

Reşbûna wan
herdû
çavan, baranê
li dilê tî
dibarîne.
Kenê wan
herdû lêvên
tenik
bêhéviyê
ji dil
direvîne.
Evîna te
ez nizamim
caran min sax
dike
lê pirê caran
min
dimirîne.



Elmedê Mele Mihemed

DEHBELORE

Wergerandina ji rûsî: **Bêkesê Têlo**

Berî kêfîkekê, min bakire cêriya me Yûlya Vasîlovnayê, da were Bodeya min a kar, da ko ez kiriya wê bidêmê. Min jê re got:

- Fermo Yûlya Vasîlovna, rûne! Bêguman pere ji te re divin, tu ewqasî şermokî yî, tu bixwe ji min naxwazî. De ka em bi hev re bihejmêrin. Baş e! Levhatna me ew bû, ko ez her mehê sîh rûbilî bidime te..

- Çel rûbil!

Na. Sîh rûbil in, ev li ba min nivîsandiye û min timî ewqas dida we cêriyan. Baş e! Tu bixwe du mehan li ba me xebitiyî...

- Du meh û pênc rojan...

- Li nik min tenê du meh hatine nivîsandin. Naxwe tu xwediya xwe û şêst rûbilî yî. Emê neh rojên yekşemê ji wan bibirin, çunkî di van neh rojan de te Kolya hînî xwendinê nekiriye, tenê te ew derxistiye seyranê, û sê rojan jî cejin bûn.

Rûyê Yûlya Vasîlovnayê sor bû û tiliyên xwe di kirasê xwe de diçikandin. Lê... Bêdeng ma.

- Eger em hersê rojên cejnan jî bibirin ko dikin diwazdeh rûbil... Jixwe dema ko Kolya nexweş bû te tenê Faryayê hînî xwendinê dikir.

Hersê rojên ko diranên te diêşiyar kebanîya min piştî firavîne tu serbest

dikirî. Îca diwazdeh û heft dibin nozdeh. Eger em ji şêstî nozdehan hilînin, dê çel û yek rûbil bimînin. Rast e? Çavê Yûlya Vasîlovnayê yê çepê tije rondik bûn, çena wê dijenî û bi bîntengî kuxiya, girêza xwe paqij kir, lê tu deng jê derneket.

- Berî sersalê jî te perdaxek û laliyek şikandibûn, em dê li vir jî du rûbilan ji wan kêmbikin. Perdax ji wilo buhatir e, hê! Diyariya dapîra min bû, lê ez çi bikim, bila xwedê ji te razî be. Erê...

Û çunkî te baş guh nedabû Kolya, lewra derketibû ser darê û çakête xwe çirandibû, ji bo vê sersariya te emê deh rûbilên din ji wan kêmbikin. Herwisa emê pênc rûbilên dîtir jî bibirin, çunkî dîsa sersariya te wa kir ko jina gavanî potîna Farya bidize. Gerek e tu guhên xwe

ÇEXOV

bidî her tiştî. Ev kar karê te ye û tu pereyan li ser disitînî!!

Û di 10ê çileyê paşîn de te bi destê xwe deh rûbil ji min standibûn.

Yûlya Vasîlovna bi kurtepiştî got:

- Na min tu tişt ji te nestendiye.

- Temaşê bike! Wisa li ba min nivîsandiye.

- Baş e.. De bila wisa bit!

- Emê bîst û heftan ji çel û yekê bibirin... çardeh dimînin.

Herdû çavên wê tijî hêsir bûn, li ser bêvila wê ya dirêj û spehî jî çend dilopên xwêdanê xuyanî bûn. Heywax li vê keça belengaz! Wê bi dengêkî nizim got:

- Careke tenê min sê rûbil ji xanima we stendine, ji bilî wan min nebirine.

- Ne wisa! Binêre min ev ne nivîsandibû, nexwe emê sê rûbilên dîtir jî ji çardehan bibirin, dê yanzdeh rûbilên te li ba min bimînin. Hê te çi got? Fermo xanima min a pir hêja. Sê...Sê...Sê, yek...Yek. Fermo. Min her yanzdeh rûbil dane wê. Bi destine lertzokî rahişte pereyan û xistine bêrika xwe û got:

- Spas.

- Pêrepêre ji hêrsan ez rabûm ser piyan û li odeyê çûm û hatim, hêdî hêdî hêrsê ez digirtim, min jê pirsî:

- Spas ji bo çi?

- Ji boyî pereyan..

- Lanet li şeytên be, min tu wêran û talan kirî, û bi ser de jî tu spasiya min dikî?

- Li gelek deverên dîtir tu tişt nedidan min...

- Nedidan te? Dikare wisa be. Min henek bi te re fikir, lê bila ji te re bibe ders. Ez dê hemû pereyên te bidime te, hemûyan, her heştê rûbilan, va min ew ji te re amade kirine, di vî qewlikî de ne. Lê çima wisa tu bêhêz î? Bo çi berxwedanê nakî? Bo çi tu bêdeng dimînî? Ma dibe, tu di vê cîhanê de ne xwedan quloçên tûj bî? Ma dibe, ko wisa tu kawik bî?

Bi kotekî bişirî û min di rûyê wê de 'dibe' xwend. Ji bo vê dersdana req min lêbûrîna xwe jê xwest, û min her heştê rûbilên wê xistine destê wê.

Bi rûyekî şermokî spasiya min kir û ji malê derket.

Min li şopa wê temaşê kir û ramiyam: 'Ko di vê cîhanê de tu xwedan hêz bî, çendîn hêsantir e'.

QAMIŞLOKÊ

Ji bo herdû canên pîrozî, bo Kemal û Şêxmûs,

Li ber bejna vê dûriyê
Destên min lawaz û kurt in
Li gerdena te nagihim
Li hembêza şevçiraxî te yî îro
Ez bê per im
Evîna te li dûriyê çengo kirim
Li pencera lêbanîna dilsojiya dîna te
de
herdixwênim
Di eşkefta asêgeha sînga xwe de
timî ezê biparêzim
Rengê rûyê evîna te
Xemla geşt û newrozên te
Ji bîr nakim rûniştina li êvarê
li ber siha dîwarên te...
Di kehnîka çavê min de
dileyizin gelek wêne...
Keftelefta ji bînanî, bêçariya
hejarên te
Leyistik û bezîneka biçûkên te
Li nav toza naverast û kolanên te

Li ser çengê balendeyê vê dûriyê
dilerizim
Li pêşîra bîranînan diponijim



KEÇA KURD

Ji henasa xwe diçêjim şêraniya wî
şîrikê zilgenimî
Çolheşîna rojgarên te
Li xûsiya çi dûriyê naqerise hingivîne
balkêşîya evîna te.



Nivînek a spî xewnan bi hêvî bû
Li bahoza vê payîzê lîlandina birûskê
bû
Rêbwarekî bê oxirî xwîndarî bû

Li darbestan li nav perda xemgînî
bûn
Li hicrika pênasînî tenahiyê
du navdarên paye berzî li mirina
hevpişkî bûn
Li mizgefta oldariyê limêjkerên
derîzana deryê te bûn
Di kendava xebatê de melevanê
jîndariya navê te bûn
Du pêşengên xemhilgirî
Karwanê doza te bûn
Li rû koçka sitemkaran
ji bo nanê kurdên hejar
Li rêbwara kargêrî bûn
Qeder bo wan kemîn danî
Li sîtava pesarê jîn, li kendalê
kevî axa mişareka xebatgêrî
hildipekîn
Li nav mija, li pehnava baweriyê
Du estêran hevdû girtin
Li rehniya birûskekê ber jor ve diçûn
Bazek bilind hambêz kirin
Li asoyê ezmanê te
Li sihwana spî heyva serfirazî
Li rû jînê diçerixîn
Li soravî rûyê roja kurdayetî
divemirîn
divemirîn
Bi kêrtûja destê mirin
Hêvî bi daxwazê birîn
Zerpelçimên vê payîzê bûne bi xwîn
Gulistana rengê jînê xemgîn dibû
Li kersiha, li vî bayî
gulhêviyên me çilmisîn.

Xwîna şehîd ji hewravê têr baran
yê xebatgêrî dilê te bû
Li te kaniya jîndarî bê
Payîzxêrek di nav şûva qurbanî de
Xweşî li te pîrozî bê
Biharek nû... Newrozekî bi hêvî bê.

Ji çavên te ew hêstirên ko dibarin
Li pelçimên gulsoşinî keske jîna
xebatek nû
xunav bikin
Di bistanê biratî de xunce li ser çiqla
vebin
Kêra şehîd sirûdek bê li nasnava te yî
îro
Wekî gata Zerdeştî bê
Ji helbesta Xanî ji ya Berzanî bê.

Despêka meha 12an, 1997
Almaniya



Bîranînên min
Ji qehwa te pêdikevin
Û ji te re...
Mîna bêdengiyê,
Bêrîkirina xwe li te dikim
Ez dizanim çendî
Di nav gavên te de
Xatirxwestin pêrgî şevê dibe
Û çîrokên nîvê şevê
Mîna heyveke li ber pencerê
paldayî

Ma tê bîra te
Dema baran ji wan barî ?
Ezê te vê şevê wêne bikim
Hemî navan ji belatînkên te
biçinim

Û te bisipêrim spêdeke bi
dîniyê pêçayî
Ez çend pirsan
Di nav şopa te de
Mîna welatekî bêxwedî
bidim bazdan

Giyayê zaroktiyê
Di hundirê kenekî xembar
Şepola helbesta nû ye
Guneha tevan
Bi valabûnê, bi kenê xwe yê..
Gulgulî bisitirîne
Xerîb im û li dawiya qehwexanê
Rojên xwe didim ber pala

ÇAVÊN


te




Bîranînên mirinê
Û dibin çavdêrê stirana penaberiyê
Di hemî gavên min de
Bêdengî dîçirise,
Karwanê poşmanî û nependiyê
şiyar dibe
Keçaniya kîjan çîvanokê
Dema tûşî tenêbûnê bû
zerezenga çûkekî
bi evîn û girî xemilandî?
Tîbûna xwe hildigirim
Awaz ji dengê min direvin
Tiliyên min kemaçeyeye mirî ne,
Dema li te guh dipelînim
Ahenga lertzok e
Sernixwîn e
D e r b a s
D
I
B
E
Bi tenê dilê xwe dilorînim
Ji tîrêjên melûliya Dastan û Şîrwan
Ji girî mişt dibim
Û rondikên xwe, bi tiblên xwe,
yên razayî dikim....

Sîmfoniyeke baranî..!
Ma mirov wilo evîna xwe dinivîse?
Şev yarmetiyê nake û...
Berf dibare
Serhildana goristanê ye
Bi kîjan afsanê derbasî simbêlên
min dibe?
Û di quncika şevê de
Dengê tîrêjên kenê wê dikim
Lo, lo, lo, lawo!
Hilperike
Tutin im, û di dawîya axaftinê de
vedimirim
Di navbera hêşir û laşekî nivistî de
ditevizim
Dibim navekî dilrawestiyayî,
... Mîna gulê
Li rêbwariyan bixwîne
Dibim lerizandina kilfteke kêr pîrs
Pirtûkê ji pêşîra xwe re dikişînin
Û di bin xwar û xuziya...,
Dengê xwe de
Dikuxum.

TENGEZARÊ MARÎNÎ



R O M Y O -
S Î N Î



YANIS RÎTSOS

Di Romyosînî de, Yanîs Rîtsos bi şiyana helbestvanekî mezin û nirxdar hewl dide ko xwîna zuha, ji nû ve, li ser rûpelên zer ên dîrokê, biçurîsîne, û hemî wateyên giranbuha yên hebûnê, mirinê, evînê, xebatê û şoreşê bi şêweyekî berhemdar û pîrozane, hem ragihîne û hem jî di herikîna dîrok û demê de, rola peyvê û awayên bi gewdekirina rûdan û bûyeran destnîşan bike.

Digel hewldana Rîtsosê azadîperest a ji bo rehdaçikandina bîr û baweriyên ko mirovatiya mirovan diparêzin û digel hevpeyivîna wî ya bi şoreşa li dijî desthilatê û ya li dijî dagîrkeran jî, Rîtsos tucarî ji asta helbestvanîyê danakeve sewiyetên derbirîna sade û hêsan ango sawa helbestvanîyê nake bi qurbana rasteqîniya rûdanê.

Helbesta ko li ser şoreşê bête nivîsandin pêwîste ko wek bejna şehîdên şoreşê bilind û payedar be, Rîtsos jî ji bo bi karanîna vê bareyê yasayên xwe yên bi taybetmendiya helbestê ve girêdayîne diafirîne ango wek helbestvan yasayên xwe yên gelemper û kûr û berfireh da ko têgihîştin û dîtina wî ji bûyeran re ji ya civatê cida be, diafirîne, û di Romyosînî de, Romyosînîya ko Yanîs Rîtsos bi henaseke dastanî û bi mercên helbestvanekî hestdar nivîsandiye, hemî belgeyên veçiriyayî yên kêlikên talanê radestî me dike, û bi zarekî şêrîn azadiyê nêzî gîyanê me dike.

Şer û kuştin û talan e, gîryan û mirin û xatirxwestina yaran û xoşewîstan e lê Rîtsos dikene!

Ken û sema û sermestî, govend û laqirdî û evîn e, lê Rîtsos digirî!

Ji bo têgihîştina vê hev kêşê yan jî vê nakokiya balkêş, -ken û girî- pêwîst e em Romyosînî bixwînin, û ji Romyosînî jî hîn bibin da ko em jî bikaribin nirxeke spehî pêşkêşî xewna xwe bikin.

Pêşgotin û wergerandina Ehmed Huseynî

1

Ev dar, ne ji boyî ezmanekî kêmtir hatine çêkirin,
Ev kevir, ne ji boyî gavên biyaniyan hatine afirandin,
Ev rû, tenê, ji boyî hetavê hatine durustkirin
Ev dil, tenê, ji boyî dadperweriyê hatine afirandin.

Cihekî req mîna bêdengiyê,
 kevîrên xwe yê şewatker himbêz dike,
 di ronahiyê de darên zeytûnan û
 werzên sêwîmayî himbêz dike,
 û diranên xwe di wan de diçikîne.

Av nîne- tenê ronahî ye.

Rê di ronahiyê de tar û mar bû.

Û sîbera dîwêr her ji hesin e.

Dar û rûbar û deng di kilsa rojê de dibûn mermer.

Reh bi ser mermerê dikevin.

Û bexçeyê nîskan bi tozê dinixume.

Qantir in û kevir in, helkehelkê dikin, av nîne.

Ji çend salan ve hemî tî ne.

Hemî pariyek ezman dicûn da qiriktaliya xwe gem bikin.

Ji bêxewî xwîn di çavên wan de tewiriye

Û mîna dara kajê ya di navbera du çiyayan de
 di dema roavahiyê de.

xêzeke kûr di navbera ebrûyên wan de hatiye kolandin

Destên wan hişk li ser tivingên wan in

Tivingên wan jî dirêjahiya destên wan in

Destên wan jî dirêjîya giyanên wan in

Torebûn li ser lêvên wan radize

Û êş - di kûrahiya kûrbûna çavên wan de- mîna stêrka di gola xwê de
 ye.

Wexta ko kulmên xwe dişidînin, hetav baweriyê bi cîhanê tîne

Wexta ko dibîşirin, hehecîkeke piçûk ji rihên wan ên hovane difire

Wexta ko radizin, diwazdeh stêrk ji bêrîkên wan ên vala dirijin

Wexta ko tèn kuştin, jiyan ber bi jor ve, bi dahol û alan, diçe,

Çend saline dirêj, hemî birçî mabûn, hemî tî mabûn, hemî hatin kuştin,
 bi deryayê û bi zemîne hatin dorpeçkirin.

Germa şewatker baxên wan zuha kir, şorahiyê xaniyên wan nixumand,

Bagerê jî dergehên wan û çend darkokên gula qedîfeyê yê li meydanê
 ji qurm ve rakirin.

Mirin tê, û di qulên sakoyên wan re dibuhure

Û zimanê wan mîna bejna kajê tûj e,

Segên wan zelûl û lawaz bûne û xwe bi sîberên xwe nixumandine

Û baran jî li hestiyên dixîne.

Di çeperên pasvaniyê de daçîkyayî ne, cigareyên ji rêxa çelekan û ji
 şevê, dikişînin.

Û çavdêriya derya berfînî dikin,

Li wir stûna heyva şikestî bin av bûbû

Ne nan maye û ne jî cibilxane
 Aniha topên xwe bi dilên xwe dadigirin.
 Gelek salan bi deryayê û bi zemînê hatine dorpêç kirin
 Hemî birçî man, hemî hatin kuştin, lê ti kes nemir-
 Çavên wan, di delkeyên pasvaniyê de, mîna aleke berfireh, gur dibin
 Şewateke mezin bi sorbûnê tê dadan
 Di her berbangekê de hezar kevok ji destên wan berbi herçar dergehên
 asoyê ve, difirin.

2

Û her cara ko şev bi kunciya şewitî dadikeve ser sînga kevir
 Dilopek av diniquite, ji sedsalan ve di gewhera bédengiyê de kolanê dike
 Û zengilê ko bi dara pelkê ya kevnare ve helawistî ye bi ser salan de
 dinehwirîne.

Çurîsk di xweliya wêranê de radizin

Û ban jî têramandina pûrta rengîn ya li ser lêva jorîn a meha temûzê
 dikin

Pûrta zer a wek mûyên garisê ko xemgîniya roavahiyê ew kişandibû.

Banoya keç; xwedana kirasê fireh û bi tirî nîşankirî di nav zilê de
 hatiye avêtin.

Li ser rê zarokek digirî û deşt jî bersiva wê bi mîha ko berxên xwe
 winda kiriye, dide.

Sîberek li ser çavkaniyê, û av jî di denê de sar û ji berfê ye.

Keça nalbend bi lingên xwas û şilbûyî

Nan û zeytûn li ser mersefê ne,

Û minareya êvarê di erzêla werzan de gur dibe.

Û li wir, li cihê bilind, kakêş- di çerxa xwe de digere- bîna rûn û sîr û
 îsota tûj derdixîne.

Ax, em dê hewcedarî çendîn hevrêşîma di çeşnê çurisîna stêrkan de
 bibin,

Da ko em bi derziyên kajê (ev, jî, dê derbas bibe) li ser dîwarê havîna
 şewitî bineqîşînin.

Ew dayika ko dilê xwe bi ser serjêkiringeha her heft lawên xwe yên

qehreman de diguvêşe, dê çendîn dirêj bike,

berya ko ronahî ji xwe re rêçekê di rêça giyanê wê yê bilind de bibîne.

Ew giranbuhayiya ko ji zemînê hiltê,

Gav bi gav zemînê û têlên ûdê dipîve

Û ûd û keman ji êvarê hetanî destê sibê, xemgîniya xwe ji pûngê û ji

darên merxê re dibêjin

Werîs jî, li ser gemiyan mîna têlan dilerizin
 Û keştivanî jî ji piyala Odîsyosî derya qiriktal vedixwe.
 Ax, nexwe, kî dê dergehî asê bike, dê kîjan şûr mêraniyê bibire
 Dê kîjan kilît dil bigire,
 û pencereyên wî wisa bi ser berfirehiya xwe de vekirîne,
 mîna ko gulistanên xwedê yên bi stêrkan tovkirî, dibînîn?
 Ev demjimêr mîna şevên şemiyê yên meha gulanê yên li meyxaneya
 keştivanan, çeleng e,
 Ev şev wek laliya li ser dîwarê hesinkerî, çeleng e
 Ev stran mîna nanê êvariya niçîrvanê isfincê, çeleng e.
 Û li wir, heyva kirîfî li ser zixuran di navbera girkokan de diherike
 zingîn bi zingîn, bi bîst rêzên ji parçeyên hesinê nala pêlavan,
 Û li wir, ew kesên li ser nêrdewanên Navpilyonî hildikişin û dadikevin,
 amade ne.
 Qelûnên xwe bi pelên taristana qalind û zivir dadigirin,
 Simbêlên wan kunciya bi stêrkan çandî ya ji Romîlî ye
 Diranên wan mîna rehên merxê di tehtan û di xwêya Derya Îcayê de ne.
 Di zencîran de çûn û di êgir de bi kevîran re peyvîn
 Û di qafê bapîran de piyala meyê pêşkêşî mirinê kirin.
 Û li nav benderên mermerê pêrgî Dîcînîs hatin
 Mersefa paşivê raxistin
 Bêhêvîbûna xwe li ser çokên xwe wek naneke cehî dubeş kirin
 Were, ey xanima ebrûyên xwêyane û destên ko ji ber perwerdekirina
 hejaran û salên dirêj bi dûmanê qirêjbûyî
 - Were, evîn di nav darên biyê de bendewariya te dike.
 Û teyrê masiyan, di şikefta xwe de, berzûrî îkona te ya tarî dibe,
 Û şûjiyê derya tal neynûkên lingên te diramûse,
 Di nav werzên reş de xweşava sor û erxewanî difûre
 Tû jî difûrin, di gîhayê stiryên şewitî de, difûrin.
 Di xakê de, reha dara mirî avê dixwaze da ko dareke kajê biteqe.
 Û dayika ko di bin qermîçekên xwe de li cihekî kûr kêrekê hiltîne.
 Were, ey xanima ko li ser hêkên zêrînî yên tav û birûskan rûdine,
 Di rojêke şîn de ko di çeşnê şînê deryayê de ye tu yê serçavka xwe bidî
 alî û ji nû ve aşîtiyê bilind bikî
 Da ko seqema gulanê li eniya te keve,
 Da ko ro wek hinarekê di kirasê te yî pemboyî de hilê
 Da ko tu lib bi lib wê li her diwazdeh sêwiyên xwe belav bikî
 Da ko li her deverê derya wek serê şûr û wek berfa nîsanê biçurise,
 Da ko kevjal xwe li ser zixuran bide ber tavê û lapûşkên xwe bi ser hev
 de biguvêşe.

3

Li vir, li vî welatî

Ji bo kêlikêkê be jî dê roj xetûreya çavên me venemirîne,

Li vir

Dê roj nivê giraniya hîmê ko me hergav li ser pişta xwe hildigirt, ji dêvla me, berbi jor ve hilgire.

Qermîtkên bên, bê henas, li jêr kaboka heyvê dişikîn

Û xelk, wek delfînên ko di ber qeyika Sikyasos re dibuhurîn, di ber sîberên xwe re dibuhurin

Û piştire, sîberên wan dibin bazê ko baskên xwe bi roavahiyê digevizîne

û li ser lingên xwe rûdine û têramandina stêrkan dike

Wexta ko em li odeya hetavê ya bi mewîjên reş raxistî xwe dirêj dikin.

Li vir, her dergehêk navek li ser kolayî ye

Navek ko temenê wî nêzî sê hezar sal e

Li ser her kevirêkî pîrozmirovek bi du çavên hovane û bi porekî di çeşnê werîsan de, neqîşandiyê

Her zilamek firîşteyek li ser destê wî yê çepê, deq bi deq, deqandiyê

Her keçek mistek ji ronahiya şor di bin kirasê wê de ye

Û pênc şeş xaçên piçûk û êşdar li ser dilên zarokan in

Wek şopa teyrê masiyan a li ser qûma roavahiyê.

Pêwîst nake hûn bînin bîra xwe, em dizanin

Em dizanin ko hemî rê berbi benderên çinîne ve diçin

Û bager- bi bilindahî - li wir, dijwar e.

Li dûrahiyê, wexta ko nîgara roavahiyê ya ji cêbsîna bendergehê şil bibe

Û wexta ko agir, li ser peravê, di kadînen kayê de lawaz bibe

Dê pîrejin li ser pileyên ko di tehtê de hatine kolandin hilperikin vê dûrahiyê

li ser hîmê giranbuha rûdinin û wek tayekî, deryayê, bi çavên xwe dirêsin

Rûdinin û stêrkan mîna ko mîratgiriyan xwe yên ji zîv bihejmêrin, dihejmêrin

Û di dawiya rojê de dadikevin da ko barûda mîslongî wek xwarinê, bidin neviyên xwe.

Erê, bi rastî jî, di zencîran de yê girêdayî xwedanê van destên xemgîn e

lê ebrûyên wî wek hîmê ko hergav bixwaze rizgar bibe li ser çavên wî yên şikestî dilerizin.

Pêl ji kêrahiyan bilind dibe guh nade berzûrî û lavlavan

Û ji bilindahiyên ba radibe

di damarên bê de gezo
 sernîşiv dibe û di pişikên de du mersef .
 Ax, dê carekê ba rabe da ko darên pirtiqalan ên di hiş de li ber xwe
 bibe
 Ax, dê du caran rabe da ko hîmê hesin çurîskekê di çeşnê pişkoka
 teqînê de berde
 Ax, dê sê caran ba rabe da ko daristanên Liyakorayê çiyayê Barnas
 berbi dînbûnê ve dehf bide
 Ê bi kulmekê ji mista xwe zordariyê bavêje bilindahiya ezmên
 Ê zencîra kadizê ji xelesa pozê wê rakişîne da ko li ser çeperan
 Tisamînko bireqise
 Ê heyv jî ji me re li daholê xîne hetanî ko dorav mişt zarokên
 xilmaşbûyî û dayikên Solyot bibin.
 Her sibeh pêximberê ji rûbarê payebilind tê,
 Li ser rûyê wî hetava xweşik diçurise
 Di bin çekên xwe de- bi viyan û bi xwebawerî- berbi Romyosînî ve tê
 Wek ko çawan karkerek li kilîseyê berbi bilindahiya xwe ve tê
 “wext hatiye“ -dibêje- xwe amade bikin
 Ji aniha û pê ve her katjimêr a me ye.

4

Bi payedariya birçiyên bi pêş de berbi herbangê ve çûn
 Di çavên wan yên hêmin de stêrkek bêdeng û tîr dibû
 Li ser milên xwe havîna birîndar hilgirtibûn.
 Leşker di vêderê re bihurîn, al bi laşan ve rapêçayî bû
 Ê serhişkî mîna hirmiyêke bejî ya xav di diranên wan de daçikyayî bû
 pêlavên wan ên leşkerî bi qûma heyvê mişt bûbûn
 Ê toza komira şevê xwe li poz û guhên wan girtibû.
 Dar bi dar, hîm bi hîm, di nav cîhanê re derbas bûn,
 derbasbûn- stîrî mîna balgehên hilgirtibûn- di xewê de
 Ê ji nav destên xwe yên tî wek çemekî jîyan bi xwe re anîn.
 Bi her gavekê re radek ji ezmên qezenc dikirin-da ko ji dest xwe
 berdîn.
 Di delkeyên pasvaniyê de, wek darine şewitî, dibûn ji bêdengiya kevir
 Ê dema ko li meydanê govend gerandin
 Banên xaniyan hejîyan û li ser refîkan bû çingçeçinka piyal û laliyên
 fêrfûrî
 Ax, kîjan stranê gupîtka çiyên hejandiye
 Laliya heyvê li ser kabokên xwe danîn û xwarin

Û di kêrahiya dilên xwe de axînek pelçiqandin
 Mîna ko kêçekê di nav neynûkên xwe yên qalind de bipelçiqînin..
 Aniha dê kî di şevê de nanê germ ji we re bîne
 da ko hûn birçîbûna xewnên xwe têr bikin?
 Kî dê - li bin siya dara zeytûnê - paşvaniya sîsirkê çinînê bike, da ko
 berbi bédengiyê ve nekeve,
 wexta ko kilsa nîveroje dîwarê asoyê boyax bike û
 navên wan ên xweşmêrane û giranbuha binuxumîne?.
 Ev zemîna ko di berbangê de bîna gulan difûrand.
 Ev zemîna ko ya me û ya wan bû
 Ev zemîna ko xwîna wan e
 Ey hawar çeqasî bîna vê zemînê xweş e!
 Çawan aniha bêyî me dergehên werzên me hatine girtin
 Çawan ronahî li ser banan û daran hatiye vemirandin?
 Kî dikare bibêje ko -aniha- nivê wan di bin axê de ne,
 û nivê mayî bi merbendan girêdayî ne?
 Bi hemî pelan; hetav ji we re dibêje beyanî baş
 Bi hemî alan, ezman ronî dibe,
 Lêbelê hêjî hin ji mêrxasan di merbendan de dimînin,
 û hin jî hê di bin axê de ne.
 Guhbidin!- di kîjan kêlikê de be zengil dikarin lêbidin.
 Ev zemîn a wan û ya me ye
 Û di bin axê de bi destên xwe yên girêdayî wêrîsê zengil digirin,
 bendewariya qiyametê dikin.
 Ranazên, ji bo bendewariya zengilê qiyametê, ticarî namirin
 Ev zemîn a ko ya me ye
 Ev zemîn a ko ya wan e
 tikes nikare ji me bistîne.

5

Di berêvara teng de li bin darên zeytûnan rûniştin
 Ronahiya xwelîreng bi tiliyên xwe yên hişk û req bêjing dikirin
 Rextên xwe vekirin
 Û dest bi pîvana ko dê tengerêyên şevê têra çendîn westan û renckêşanê
 bikin, kirin
 Çendîn qiriktalî di girêkên tolika bejî de ye
 Çiqas mêrxasî di çavên lawikê pêxwas ê ko al berbi jor ve bilind dikir
 de ye.
 Li deştê, hehecîka dawîn bendewariyeke dirêj kir
 Wek beneke reş li ser zendika payîzê li ber bê li ba dibû.
 Tişteki dîtir nema ye- tenê- xaniyên wêrankirî dişewitin.

Û ew kesên ko di bin keviran de razayî ne ji mêj ve ji nik me çûne,
Gumlekên wan çiryayî ne û sînda wan li ser dergehê herifî
nivîsandîye.

Tikes negiriya. Wexta me tinebû,
lê bêdengî pir bi lez berfireh bû

Û ronahiya ko bi ser peravê de diket, nerm û lihevhatî bû
Wek karûbarên malê yên jina kuştî.

Aniha, wexta ko baran digel pelên genî yên
dara pelkê xwe berde zemînê
dê çi bi serê wan bê?

Wexta ko hetav li ser cilan ewrekî mezin zuha bibe
wek beqeke pelçiqî li ser livîna cotkarekî
dê çi bi serê wan bê?

Wexta ko êvarê, leglegê berfê, hişkbûyî, li ser
lûleya sopê radiweste?

Dayikên pîrejîn xwê bi ser êgir de û xweliyê
bi ser serê xwe dadikin

Werzên Monîmfasyayê hildikin da ko libek
tirî devê dijmin serxweş neke

Hestiyên bapîrên xwe digel çetel û kêrên zîvînî
dixin tûrekî de

û li derveyî dîwarên welatê xwe bi çolê dikevin
Li cihekî digerin da ko di şevê de tovên xwe tê de
biçînin.

Aniha, pir çetin e, ko em bikaribin peyvîne
Hêz- kêmtir û nermtir ji peyvên dara qeresiyê,
peyda bikin

Destên ko li bexçan û li ser çîyan û li binê deryayê
mane, nayên ji bîr kirin

Em dê çawan bikaribin destên wan ji bîr bikin?

Destên ko li ser qondaxa tivingê qerimîn û hişkbûn

dê çawan aniha bikaribin li kulîlkan bigerin,

dê çawan bikaribin spasiyên xwe li ser kabokan,
li ser pirtûkêkê,

li ser sînga stêrkekê, pêşkêş bikin.

Dê wextekî dirêj bikişîne, û gerek em dengê xwe bilind bikin.

Hetanî ko nanê xwe û dadperweriya xwe bibînin.

Di berbangê de, piştî bahozê, du depên kelekê di qûmê de daçikiyan,
Kanî kelek?

Haletê cot di zemînê de daçikiyaye, bager e, zemîn şewitî,
kanî cotkar?

Xweliya dara zeytûnê, xweliya werzan, xweliya xênî.
 Şeveke seqemdar digel stêrkên xwe di pêlava cotkarî de ne.
 Belgeyên kindira zuha di kulînê de ne- agir nehingiviye wan.
 Çaydanê çayê reşbûyî li ser êgir e- Di xaniyê girtî de av bi tena serê xwe dikele.

Wexta wan tinebû ko xwarinê bixwun.

Li ser destikên dergehên şewitî
 rehên daristanê dixuyan- Xwîn di rehan de diherike.

Û pêjna gaveke naskirî tê. Ma gelo kî ye?

Gava naskirî bi mîxên pêlava xwe, hildikişe.

Xişexişa rehan di kêvir de, mirovek tê.

Peyva nehînî. Mohra baweriyê. Birader e. Êvar baş.

Bi vî awayî- nexwe - dê ronahî darên xwe bibîne

Û dar jî dê- rojekê ji rojan- meweşa xwe bibîne.

Cewdikê zilamê mirî hê jî mişt av û ronahî ye.

Êvar baş. Ey birayê min. Tu vê yekê baş dizanî. Êvar baş.

Di kozika xwe ya textînî de, xanima pîrejin Roavahiyê ta û dermanên xwarinê difiroşe.

Tikes nakire, bikir nînin.

Hemî berbi zemîna bilind ve; hilperikîne serê çiyê,

Û aniha, daketina wan pir çetin e,

Û pir çetin e jî ko bilindahiya xwe ji kesî re bibêjin,

Û li nav benderan wexta ko gencên mêrxas, şevêkê, paşîv dixwarin

Navikên zeytûnan û xwîna zuha ya heyvê li şûna wan man,

Digel pîvana gelêrî ya tivingan

Û roja dîtir, çûkan, jibermayên nanê wan xwarin,

Û zarokan jî, ji darikên şixatê yên ko cigareyên wan vêdixistin

û ji darên belalûka heyvê, lîsk ji xwe re çêdikirin.

Û kevirê, ko li bin dara zeytûnê, di nîverojê de, li beramberî deryayê, li ser rûniştibûn,

sibehê dê ew kevir di tenûrê de bibe kils.

Û sib na disib em dê malên xwe û asîtanka Sant Savyorê bi wê kilsê spî bikin,

Û di roja siyemîn de, li cihê ko serên xwe danîne, em dê tovan biçînin,

Û kulîlkên hinarê, mîna kenê pêşîn ê zarokê yê li ser sînga rohilatê, dê

bibişkivin.

Û piştê em dê li ser kêvir rûnin da ko em dilên wan bixwînin.

Mîna ko -cara pêşîn e- em dîroka mirovatiyê dixwînin.

6

Wisa, bi hetavê re di sînga deryayaya ko spîbûn bi ser kirasê li hemberî rojê dadikir,

Birûsk û êşa tîbûnê duqat û sêqat hatine hejmartin,
 Ê xwîna birîna kevnare ji destpêkê ve hate hejmartin
 Ê dil, li pêşberî xaniyan, wek pîvaza Arcîvê
 di qiçîna germê de, şewitî.

Destên wan bêtir û bêtir rengê zemînê wedigirtin.

Çavên wan bêtir û bêtir digel ezmên digunciyân.

Denên zeytê yên ji heriyê vala mane.

Piçek giranî û mişka mirî li binî ne.

Mêrxasiya dayikê digel denê ji herî û avgîrê, zuha bû.

Ê benîştê wêranê wek barûdê tûj e.

Em dê aniha zeytê ji boyî çira Santa Barbara ji kûderê peyda bikin

Ê em dê pûngê ji boyî dûmançêkirina bixûrê bo îkona zêrînî a êvarê ji kûderê peyda bikin.

Ê pariyeke nanî bo şeva parsek da ko

li ser kemanê strana stêrkê ji me re bistirê?

Di himbêza girkokên doravê de, hirmî û hûlî û xox bûne şevpest û sîber.

Zemîn jî bi guleyên topan û bi goristanan hatiye cotkirin.

Cîgeh û sengerên serekî yên wêranbûyî bi ezmên ve pîne bûne, hergîz odeyek bo mirînine dîtir nîne.

Odeyek bo şîniyan nîne da ko rawestin û guliyên xwe bihûnin.

Ê xaniyên şewitî, bi kortalên çavên xwe yên valabûyî, derya mermerî ji dûr ve dibînin.

Ê gule di dîwaran de daçikyayî ne;

wek kêran di kêleka pîrozpeyayê

ko bi dara kajê ve, li rada rojê, hatiye girêdan,

Ê mirî li ser piştên xwe, xwe didin ber tîna hetavê.

Ê wexta ko êvar tê, leşker, li ser tehtên reş, li ser

zik, wan dixijiqînin,

Bi pozên xwe li derveyî mirinê li bê digerin,

Digerin- pariyeke çerm dicûn- li pêlava heyvê digerin,

Kulmên xwe li bin guhê tehtan dixînin da ko

dilopek av derbiçe,

lê -li aliyê din- dîwar vala ye,

Ji nû ve dengê guleya topê ya ko berê xwe dide deryayê, dibihîzin,

Ê ji nû ve li ber dergeh nalenala birîndaran dibihîzin.

Tu bi kû de diçî?

Birayê te gazî te dike.

Şev - li her derê- ji sîberên keştîne biyanî hatiye avakirin.

Hemî rê bi dîwarên herifî hatine birîn.
 Tenê rêça ko berbi zinaran ve hildikişe, vekiriye.
 Nifiran bi ser qeyikan de dibarînin û dev li zimanên xwe dikin
 da ko êşa ko hê nebûye hestî, hest bikin.
 Li paş çeperan, li beramberî serleşkerên serjêkirinê, radiwestin û
 pasvaniya kelehê dikin
 Di bin cilan de, laşên wan şildibin,
 lo, bira can, ma tu newestyayî?
 Guleyê di dilê te de bişkojgirt,
 Pênc gulên qedifeyî di bin çengê tehta zuha de, şîn tên,
 Bînxweşiya nazenîn keser bi keser, henas bi henas, serpêhatiya efsanewî
 dibêje
 - Ma nayê bîra te?
 Pêvedan bi pêvedan, birîn, çîroka jiyanê ji te re dibêje,
 Û kulîlka biharê ya ko di qirêja neynûka mezin a lingê te de hatiye
 bişkiwîn
 Li ser spehîbûna cîhanê ji te re dipeyive.
 Tu xwe bi destekî digirî, destê te ye, bi xwêya deryayê hêwî bûye.
 Û derya jî deryaya te ye.
 Wexta ko tu mûyekî ji serê bêdengiyê hildikî
 mastê dara hejîrê qiriktaliyê dibarîne.
 Tu li kûderê bî ezman te dibîne.
 Û stêrka êvarê, giyanê te wek cigareyekê di nav tiliyên xwe de dipêçe
 wisa li ser piştê xwe dirêj kirî tu dikarî giyanê xwe bikêşî,
 û destê xwe yê çepê bi şeva zelal û mişt stêrk, şilbikî,
 Û dema tu destê xwe yê rastê li tivinga xwe, destgirtiya xwe, bialînî,
 bîn bîra xwe ko ti carî ezman tu ji bîr nekiriyî.
 lewra tu nameya wê ya kevnare ji bêrîka xwe derdixînî
 û tu - di wexta ko tu heyvê bi tiliyên xwe yê şewitî vedikî-
 li ser mêranî û serbilindahiyê dixwînî.
 Tu yê hilperikî -piştê- rê û tu yê hilkişî cîgehê çavdêriya dorava xwe,
 tu yê tivinga xwe bi stêrkan dagirî,
 tu yê guleyekê berbi jor de, bi ser dîwar û asêgeh û kelehan de, berdî bi
 ser çiyayên
 ko mîna leşkerine birîndar xwe çemandine da ko
 tu şevpestan bitirsînî û wan berbi sîberê de dehf bidî-
 Tu yê guleyekê rasterast berdî sînga ezmanan da ko
 tu mertalê şînahiyê birîndar bikî,
 Mîna ko tu yê di gumlekê wê de,
 memika jina ko sipêdê dê
 şîr bide zaroka te, bibînî
 Mîna ko- piştî derbasbûna salan- tu yê destikê

dergehê xaniyê bapîran bibînî.

7

Xanî, rê, hirmiya bejî,
 mirîşkên ko li hewşê qalikê rokê dinikulînin.
 Tu wan nas dikî, ew jî te nas dikin.
 li vir li jêr di nav çiqulan de marê darê
 çermê xwe yî zer guherand
 li vir li jêr mûristanê
 û keleha mêşa hingiv digel pevçûnên xwe
 Ê di eynî dara zeytûnê de qalikê sîsirkê sala çûnyî
 Ê dengê sîsirkê vê salê
 Ê li bexçeyên nîskan sîbera te, ya wek segekî bêdeng bi pey te dikeve,
 pir diêşe.
 Segekî dilsoj - di nîverojê de li tenîşt xewa te ya zemînî rûdinê û dara
 rûlê bîn dike.
 Ê danê êvarê xwe li lingên te dialîne û çavdêriya stêrkekê dike
 Bêdengiya hirmiyê ya ko li ser rehnên havînê geş dibe, li wir e.
 Xelmaşbûna avê ko li hawirdora rehên dara xernûbê digere- li wir e.
 Sê sêwî li ser kirasê çavkaniyê ne.
 Ê bazek di çavên wî de dimire
 li wir li bilindahiyê, li paş daristana merxê,
 Tu mîna kilîseyî San Jonî ya li gund, melûl dibî,
 Mîna dilopên çûkê spî yên ko hetav wan li ser
 pelekî pan yê tûyê zuha dike.
 Ê ev şivanê ko xwe bi eyarê mîhê rapêçandiye.
 Di her mûyekî ji mûyên laşê wî de çemekî wî yê zuha heye
 Di her kunekê ji kunên bilûra wî de daristaneke biyê heye
 Ê girêkên darê wî eynî wek girêkên
 wan depên kelekê ne;
 depên ko cara pêşîn li şînbûna Hîlîzbontê xistibûn.
 Pêwîst nake tu bînî bîra xwe çûnkî
 rehên dara pelkê ji xwîna te ne.
 Ê dorav jî sosin û gula qedîfe ye.
 Di qîçîna nîverojê de, bîra bêdeng
 bi dengê gurover, cameke reş û bayekî spî, ronî dike.
 Dengvedanek di çêşnê denên ji heriya kevnare de,
 heman dengê kevnare ye.
 Ê her şev, heyv, termê miriyan dizîvirîne ser piştî wan,
 Bi tiliyên xwe yên berfinî, di rûyên wan de, li kurê xwe digere,

Li kurê xwe yî çen birîndar û mijank kevirînî, digere
 Li bêrîkên wan digere, hergav dê tişteki bibîne,
 Hergav em tişteki dibînin.

Kilîtek, nameyek,

an jî demjimêreke ko li ser demik heftan rawestiya be, em ji nû ve wê dadigirin,

Û demjimêr dest bi bizavê dikan.

Sipêdê, dema tu cilên wan şil bikî,

û di nav pişkoken xwe yên leşkerî de rût bimînin

Wek perçeyên ezmên di nav stêrkên havînê de,

Wek çemê di nav darên kindirê de,

Wek tengerêya li hev pêçayî, ya serê biharê, di nav darên leymûnan de,

Wê çaxê renga em pêrgî navên wan bibin û em biqîrin:

Em hez dikan.

Wê çaxê, lêbelê ji nû ve,

renga ev tişt dûr bixuyin,

Lê pir nêzik in, mîna tu di taristanê de destekî biguvêşî û jê re bibêje:

Şev baş

Bi dilsojiya qiriktalane ya mirovê sergombûyî wexta ko li welatê xwe vedigere

Û tikes nema wî nas dike, ne jî mirovên wî çûnkî mirin naskiriye,

Û jiyân, berî jiyânê û piştî mirinê jî naskiriye

yeko yeko mirovên xwe nas dike, ne tal e, sipêdê, dibêje.

Û xweş bawer e ko dirêjtirîn rê

berbi dilê xwedê de kintirîn rê ye.

Û kêlîka ko heyv, bi hesret, maç gerdana wî bike

Kêlîka ko ji ser keviya pencerê xweliya

cigareya xwe dawêşîne

renga ji bo wê baweriya xwe bigirî;

baweriya wî ya bi daran û stêrkan û hevalan.



Çîrokên ji berîka pêşî:

Teraziya Xêr û Gunehan Karel Çapek

Wergerandina: Zagrosê Hajo

Mêrkujê gelek caran, yê bi nav û deng, yê gelek fermanên girtinê di derbarê wî de hatine der û yê ko leşkerek ji polîsan û detektîvan li pey, tawanbar Kugler daxwiyaniyek da û got, ko ew hemû jî ti caran nikarin wî bigirin û bi rastî negirtin jî, bi kêmayî bi saxî ew negirtin. Polîsê dawî, di zik hev de kuştîyê wî yê jimara nihan, dixwest wî bigire, çend gule jê xwaribûn. Rast e, wî yê polîs kuşt, lê wî bi xwe jî heft gule xwarin, ji wan sisê bi timamî kujdar bûn. Bi vê darîçav ew ji dada zemînî rizgar bûbû.

Mirina wî wilo zû hat, ko êdî wext pêre nebû, da bi êşeke taybetî

biheste. Dema canê wî dev ji laş berda, wî karîbû têr ji xwe re li ser ecêbên wê dinyayê matmayî bimîne, ew dinyaya bê dîmen, sipîçolkî û ta nemayê vala, lê canê wî matmayî nema. Mirovê ko li Amerîkayê di zînadanan de mayî, ji xwe re wê dinyayê jî hema weke hawîrdoreke nû dibîne, ko tê de jî bi hinek mêranî mirov dikare cihekî xwe li pêş, weke li her derî, bibîne.

Dawî bêçare roja Kugler jî ya Xêr û Gunehan hat. Ji ber ko li ezmanan her û her rewşeke sermedî, ya awarte heye, ew li şûna ko were ber sûndxwariyan, weke ko li gor tawanên xwe divabû hatibana, ew hate ber encûmenekê. Eywana dadegehê bi şêweyekî hesan raxistî bû, weke dadegehên zemînê bû; ji ber sedemên, ko winê nêzîk nas bikin, xaça, ko dîdevan pê sûnd dixun li wir nebû. Dadvan sisê bûn, bi tevayî sere bûn, rihspiyên giran xwediyên rûyên hişk û ziwa bûn. Formalîte hinekî kelê bûn: Kugler Ferdînan, bêkar, di filan rojê de bûye, di bêhvan rojê de miriye... Li vir hate xwiya kirin,

ko Kugler nizane kîjan rojê miriye; wî di cih de dît, ko ev nezanî wê ziyane di çavê dadegehê bigehênîyê, ew di cihê xwe de hişk ma.

"Tu xwe bi çi gunehkar dibînî," serdadvan pirsî.

"Ne bi ti tiştî," Kugler bi serhişkî got.

"Dîdevan bênin," serdadvan keserek kişand.

Li hemberî Kugler kalekî mezinî weke bertelaşkî, hema bêpîvan mezin, rûnişt, xeftanekî şînî bi stêrikên zêrîn neqîşandî, lê bû; bi hatina wî re dadvan rabûne serxwe, û Kugler jî rabû ser piyan, bê viyana xwe matmayî mabû. Piştî ko yê kal rûnişt, ji nû dadegeh jî rûnişt.

"Dîdevan," serdadvan dest pê kir, "Xwedayê Mezin, vê Encûmena Dawî, win xwestine, da di babetê Kugler Ferdînan de win şehdebûnê bidin. Tu Rastaxêvê herî Mezin, pêwîst nake ko tu sûndê bixwî. Ez ji we dixwazim, ji bona giriftarê, ko win ji mijarê dûr nekevin û nedine pey hûrekên, ko girêdana wan bi pêlkirina qanûnê re nîne. Û win, Kuglero, axaftina dîdevan nebire. Her tişt xwiya ye, tu bidî mandelayê jî, pûç e. Fermo bere birêz dîdevan, bibêje."

Serdadvan wilo got, bi rehetî herdû anîşkên xwe danîne ser masê û berçaykên zêrîn jêkirin, xwiya bû ko ew xwe ji axaftina dîdevanî dirêj re amade dike. Kaltrîn endamê dadvaniyê keysa xwe li xewê xweş kir. Ferişt, nivîskarê dadegehê, pirtûka jiyane vekir.



Dîdevan Xwedê hinekî kuxî û dest pê kir:

"Erê, Kugler Ferdînan. Ferdînan Kugler, kurê karmendê fabrîkeyê, hê ji piçûkayî de zarokekî nehs bû; lo lawo, tu çi xirab bûyî! Pir hez ji dayika xwe dikir, lê fehêt dikir wê bide der; ji vê ew zirz bû û bi ya ti kesî nedikir. Tê bîra te, çaxê ko te tiliha bavê xwe gez kir, dema xwest li te bide, ji ber ko te kulfîk ji bexçê nivîskarê dadperweriyê dizîbû?"

"Ew kulfîk ji Îrma keça tehsîldar re bûn," hate bîra Kugler.

"Ez dizanim," Xwedê got. "Hingî ew heft salî bû. Û tu nizanî piştê çi pê hat?"

"Nizanim."

"Mêr kir, Oskar kir, kurê xwediyê fabrikê; wî ew necisand û dema beravêt mir. Ma Ruda Zaruba tê bîra te?"

"Ma çi bi wî hat?"

"Kuro, ew bû keştivan û li Bombayê hate kuştin. Win herdû ji hemû zarokên bajêr xirabtir bûn. Kugler Ferdîmand hê deh salî bû dest bi diziyê kir û her û her derew dikirin; diçû nav civatên pîs, weke ya serxweş û parsek Dlabola, yê ko pêre xwarina xwe leva dikir."

Dadvan destê xwe hejand, weke ko bibêje ev der ne cihê van gotinan e; lê Kugler bi xwe pirsî: "Û... çi bi keça wî hat?"

"Bi Marîka?" Xwedê got. Ew bi yekcarê filitî. Çardeh salî mêr kir, bîst salî mir û dibêr zikratan de tu hatî bîra wê. Tu çardeh salî bûyî, tu serxweş ketî û te ji malê bazda. Bavê te gelek kul û derd xwarin û dayika te weke baranê hêstir barandin; te mala xwe bêrûmet kir, û xwişka te, xwişka teyî spehî Martîçka, zava nedît, zavayê ko were mala dizan. Hêjî bi tenê, li ser xêr û qencyên bi ingûşk, yên ko xelkên diloan wê pê birîndar dikin, di xizaniyê de dijî."

"Niha di vê kêliyê çi dike?"

"Di vê kêliyê de ew li dikana Vlk e û tê dikire, da berî tarî bikeve, karibe bidirû. Ew dikan tê bîra te? Te carekê li wir xareke camî kirî, tu hingî şeş salî bûyî; û hê roja pêşî te xar wînda kir û te êdî ew nema dît. Tê bîra te, tu çawa hingî ji kerb û xeman girî?"

"Ew higî gindirî kû?" Kugler bi dilbijî pirsî.

"De ew gindirî şirikê. Ma ne, kuro, ew hêjî li wir e, ev sih sal di ser e derbas bûne. Ha di vê kêlîkê de li ser

erdê baran dibare û xara camî di nav ava sarî bi xuşin de dilerize."

Kugler dilşekstî serê xwe tewand. Lê serdadvan berçavka xwe danî ber çavên xwe û bi nermayî got: "Dîdevano, dive em werine ser mijara xwe. Yê sûcdar kes kuştiye yan na?"

Xwedayê dîdevan serê xwe hejand. "Nih kes kuştine. Yê pêşî di pevçûnekê de bû. Ew kete zîndanê û ew li wir xeyisî. Ya din yareke bi paşmêr bû. Ji ber wê cezayê mirinê danê, lê wî bazda. Yê sisiyan kalek bû, ko Kugler hat ew dizî. Yê çaran nobedarekî şevê bû."

"Ma ew mir?" Kugler kire qêrîn.

"Ew piştî sê rojan mir," Xwedê got, "bi êşeke dijwar û şeş zarok li pey xwe hiştin. Yên pênc û şeşan du jînûmêrên pîr bûn; ew bi balte kuştin û bi tenê şazdeh kron bi wan re dîtin, di wextê, ko wan bêhtirî bîst hezar kronî veşartibûn."

Kugler xwe çend kir: "Li kû, ezbenî!"

"Di nav doşekê de," Xwedê got. "Di kîsikekî hîzar de, li nav doşekê ew pereyên ko bi ribayê û bi kurbûnê maliştibûn, veşartibûn. Yê heftan li Amerîkayê kuşt; ew penaber bû, hevvelatîyê Kugler bû, weke zarokekê bêçare bû."

"De naxwe ew di nav doşekê de veşrtibûn," Kugler matmayî kire pistepist.

"Erê", dîdevan berdewam kir. "Mirovê heştan, yekî peyade bû, ew kete devê riya wî de, çaxê ko bi pey diketin. Hingî periwên dinanên wî kul bûbûn ji êşan sewdan di serî de nemabû. Kuro, te jî gelek êş û derd xwarin. Yê dawî polîsek bû, ko hema berî bimire, geha wî bikuje."

"Wî çima kuştin dikir?" serdadvan pirsî.

"Ew jî weke her kesî," Xwedê bersiv da; "ji torebûnê, ji bona bidestxistina peran, carnan bi plan û carnan ji korfelaqî ve, carnan ji kêfa dilê xwe re û carnan jî ji mecbûrî bû. Ew destvekirî bû û carnan alîkariya xelkê jî dikir. Bi jinan re qenc bû, hez ji lawiran dikir û xwediyê soza xwe bû. Ma ez qencyên wî bibêjim?"

"Spas," serdadvan got, "ne gerek e. Sûcdaro, tiştêk heye ko tu ji bona parastina xwe bibêji?"

"Na," Kugler bêpêçdan got; ji ber ko êdî jê re her tişt weke hev bû.

"Dadegeh wê xwe bikişêne ji bona şewerdariyê," serdadvan ragehand, û hersê dadvanan xwe dûr kirin. Xweda û Kugler mane di eywana dadegehê de.

"Ev kî ne?" Kugler pirsî û serê xwe bi hersêkên dûrdiktin ve kir.

"Mirovên weke te ne," Xwedê got. "Li dinyayê dadvan bûn, û li vir jî dadvaniyê dikin."

Kugler tilihên xwe gez kirin. "Min hizir dikir... ma ne, min guh nedida meselê, lê min goman dikir, ko gerek e te dadvanî kiribana, ji ber ko tu... ji ber ko tu..."

"Ji ber ko ez Xweda me," kalê mezin gotina wî tewa kir. "Lê ji xwe ev e mesele, tu dizanî? Ji ber ko ez bi her tiştî dizanim, ez ji binî nikarim dadvaniyê bikim. Jixwe ev yek nabe. Ne tu nizanî Kuglero, bê kê hingî gilehê te kir?"

"Ez nizamim," Kugler matmayî got.

"Lucka, ya berdestîka meyxanê, ji zikreşî gilehê te kir."

"Li min negirin," Kugler zirav da xwe û got, "lê we jibîr kir bibêjin, ko min li Chicago ew Teddyê pîs kuşt."

"Na bavo," Xwedê bi rikberî got, "ew jê fistiqî û hêjî sip û sax dijî. Ez dizanim, ew gelac e; lê wekî din, kuro, ew mirovekî pir baş e û zaf hez ji zarokan dike. Hema wilo behwer neke, ko kesek hebe bi yek carê pîs be."


"Çima jixwe win... çima tu, Xwedayo, bixwe dadvaniyê nakî?" bi ramanî Kugler pirsî.

"Ji ber ko ez bi her tiştî dizanim. Heke ko dadvanan bi her tiştî, bê kim û kurî bi her tiştî, zanibe, dê ew jî nikaribin dadvaniyê bikin; bi tenê wê di her tiştî bigehin, ta ko dilê wan ji ber biêşe. Ma ezê çilo te tawankar bikim? Dadvan bi tenê bi ziyar û gunehên te dizane; lê ez her tiştî li ser te dizanim. Her tiştî Kuglero. Ji ber wê ez nikarim te tawankar bikim."

"Nawxe vêca çima... ev xelk... li ezmanan... dadvaniyê dikin?"

"Ji ber ko mirov yên hev in. Ez, weke ko tu dibînî, bi tenê dîdevan im; lê ceza, tu dizanî, li ser cezê mirov biryarê didin- li ezmanan jî. Ji min behwer bike Kuglero, ev di cihê xwe de ye; ti dad ji ya mirovanî pê ve bikêrî miorvan nayê."

Di wê kêlîkê de dadegeh ji şewermendiyê vegera û serekê Encûmena Dawî bi dengekî bilind biryar got: "Kugler Ferdînan ji ber neh caran li pey hev tawan û mêrkujiyên plankirî kirine, ji ber kuştin û diziyê, ji ber dubarekirina tawanan, ji ber hilgirtina çekan, ya bêdestûr û ji ber diziya kulîlkan tu hatî cezakerin, cezayê te dogeh e, tê ta nemayê di dogehê de bimênî. Pêkanîna cezê yekser cih digire. Fermo, doza peyre bênin. Ka sûcdar Machat Frantîşek li vir e?"



Pirtûka ji-kevilê-xwe-der

Her çi kesê xwe ber bi karûbarê nivîsandinê ve bike, berî ko tiştinan binivîse divêt hînî rastnivîsandinê bibe. Rastnivîsandin zelalkirin û delalkirina zimanî ye. Divêt hertim di bîra mirovî de be ko fikir û ziman li ser hev rolekê enteraktîf dilehîzîn: fikir çiqas zelal be dê ziman jî wesa zelal be, ziman çiqas zelal be dê fikir jî wesa zelal be. Nemaze zimanê nivîsandinê divêt ji tevliheviya devokan û bêformîtiya zimanê axaftinê xilas bibe.

Di warê rastnivîsandin û zelalkirina kurdîyê (kirmancî) de, hêja ye ko her kurdekê/a xwedîpênûs pirtûka Arif Zêrevanî ya bi navê *Bingehên rastnivîsandina kurdîyê (kirmancî)* bi dest bêxe û wekî formateka rastnivîsandinê hertim berdest bigre.

Pirtûk ji çar beşan pêk têt: 1) raçandina tekstê, 2) nivîsandina navên kesan, girdek, hûrek, hejmar, tewang, veqetandek û kurtekan, 3) niqteşanî û 4) servehî

Bi rastî jî gava ev pirtûk ligel afîşa danasîna wê ket destê min de û di serê afîşê de sernivîsa »pirtûka paşerojê« li ber çavên min ket, ew sernivîs bi min wekî idiyeka felsefî û pir-ji-hedê-xwe-der hat. Dr. Michael L. Chyetî (sernivîskarê beşa kurdî ya Dengê Emerîkayê) jî ev gotina »pirtûka paşerojê« di pêşgotina xwe de bi kar anîbû.

Wextê min pêşgotina Michael L. Chyetî xwend û pirtûk jî bi hûrayî li ber çavên xwe gerand, min êdî fêm kir ko ji bo çi ev pirtûk »pirtûka paşerojê« ye. Kurd bi tevayî ti chemiyetê nadin zimanê xwe ye zikmakî. Hegî roj hat û nîfşên bi dûv me re problema zimanê xwe ye zikmakî wekî problemeka hebûn û tinebûna nasnameya xwe ya neteweyî dîtin, hingê dê qîmetê berhemên wiha hîn baştir bête fêm kirin.

Arif Zêrevan, bi metodeka zanistî xwe dispêre normên gramerê û di wê rêça ko Celadet Alî Bedir-Xanî ji bingehên kirmanciyê re vekiriyê

de, mijara rastnivîsandina kirmanciyê hûr û kûr dikê. Arif di hinek cihan de ji Celadetî vediqete û piştî xwe dide Ehmedê Xanî, klasîkên kirmancî û hinek herêmên Kurdistanê. Cihê ko ew ji Celadetî diqete, bi ya min, ti qelsîtiyê ji wî re û ti kêmasiyê ji Celadetî re jî naîne. Bileks, Arif kevîrekê xurt dadine ser wî dîwarê ko Celadetî ava kiriye.

Arif bi awayekê zelal û bi uslûbekê aktîf mijara rastnivîsandinê rave dike û ji raçandina tekstê dest pê dike. Ew, raçandin û rastnivîsandina hemî babetên tekstan bi nimûneyan li ber çavên xwendevanan radixe. Arifî sernivîs, nêvbersernivîs, hemî babetên veguhostinan, kurtek, hûrek û heta bigihî nîşandekên vavêrkirinê, bingehên rastnivîsandina kurdiyê bi kêlm û bi teknîkê pisporî raçandiye.

Lê esil, karê nû ye ko Arifî kiriye, di warê jimarnav, tewang û veqetandekên navdêrên nebinavkirî de ye:

»Tewang di kurdiyê de hêmanekê bingehî ye. Terikandina tewangê siqetiyekê diêxe gramera zimanê me. Gava navdêr neyên tewandin mirov nikare bizane ka kirarê lêkerekê û bireserê lêkerekê çi ye û kî ye. Heger em bibêjin 'Hesen ker kuşt' ne diyar e ka Hesenî ker kuştîye an kerî Hesen kuştîye. Ji bo em bizanin ye ko ker kuştî Hesen e divêt em 'Hesenî ker kuşt' binivîsin« (Zêrevan, Arif (1997), *Bingehên rastnivîsandina kurdiyê*, rûp. 83).

Bi taybetî di mijara tewangê de – tewanga pronavan, tewanga navdêrên binavkirî û ya navdêrên nebinavkirî de – divêt hemî kesên ko bi zimanê kurdî dinivîsin, carekê şewqeya xwe danin ber xwe û bibêjin ka me şaşî li kû derê kiriye, ka ji tiştên me heta niho nivîsandî çi xelet in û çi rast in. Hinek dikarin bibêjin »ma çol e! Arif Zêrevanî kitêbek nivîsiye, îca em rabin bibêjin tiştên me heta niho nivîsîne xelet in«. No, ez nabêjim tiştên hatîn nivîsandin çewt in an jî rast in! Lê hegî em bispêrin metodên gramerê û lêkolînan li ser bingehên rastnivîsandinê, tewang û tewangên veqetandekan bikin, hingê dê rastî an jî çewtî derbikeve ser kefê, û hingê em dê baş bizanin ka kerî Hesen kuştîye an jî Hesenî ker kuştîye! Emê bizanin ka nivîsandina »xebatek(a) akademîk« rastir e an jî »xebatek(e) akademîk«; »hevalek(ê) baş« rastir e an jî »hevalek(î) baş«.

Di heqê jimarnavan de jî Arif xwe dispêre klasîkan û ji wê nêrîna ko îro raser e bi dîr dikeve. Ew dibêje ko zayenda hemî jimarnavan mê ye û divêt jimarnav bi »ê-yê« bêne tewandin. Li gor wî jimarnavên rêzê jî bi arîkariya pronavên îşarkî »yê«, »ya« û »yên-ê« tên çêkirin.

Yanî: »Ez 7-ê dibînim«, »mehîna 40-ê«, »zelamê 6-ê«, û h.d.

Bi ya min – ji ber tevlihevî û xeletiyên ko di warê tewangê de tên kirin – heger nivîskar û xwedîpênûsên kurd di heqê vê pirtûkê de bêdeng û bêreaksyon bimînin, ev dê ji bo zimanê kurdî xemgîniyek be lê belê berî hemî kesê kêmasiyeka mezin be ji bo nivîskarê/a kurd.

Hinek dikarin bibêjin Arif devoka herêmekê dixebitîne. Hegî devoka ko Arif dixebitîne li gor fonetîka zimanî û normên gramerê ti siqetî tê de nebe û ew xwe bispêre pîrensîbên zimanî yên zanistî, wê çaxê tê wê manê ko Arif li dûv zelalkirin û delalkirina zimanî ye. Nimûneyeka biçûk, Arif di şûna bêjeya »cuda« de »cida« dixebitîne. Îca hegî rayê bêjeya cida ji bêjeya »cih« û ji-cih-der-bûnê be, wê çaxê bêjeya »cuda« dengêkê xirabûyî ye, ne rast e, ya rast bêjeya »cida« ye. Mirov dikare gellek nimûneyên wiha rêz bike.

Arif di heqê gihaneka »ko-yê« de jî dibêje ew nizane piştî mirina Celadetî û Kamiranî di nêv kurdan de çawa »ko« winda bû û »ku« di şûna wê de belav bû. Bi rastî ez jî nizanim, yên dizanin bila bibêjin.

Mebest ne ew e ko ez vê xebata Arifî bifirînim ber perê asmanan. No, wekî min li jorê jî got, di warê rastnivîsandinê de hinek idiyên vî camêrî yên »nû« hene. Piştî van idiyan, bi ya min, divêt kesên ko xwe pisporên vî karî dibînin careka dî mijara rastnivîsandinê bêxin binê mercekê, da diyar bibe ka idiyên Arifî rast in an ew ji xwe re li gorî devoka xwe hinek tiştan dibêje.

Dilxwazî ew e ko ne tenê di warê rastnivîsandinê de, di hemî babetên lîteratûra kurdî ye de berhemên hîn hêjatir û hîn rastir bêne afirandin.

Ez wê yekê jî ji bîr nekim ko ji aliyê xwe yê dîdarî ve jî pirtûka Arif Zêrevanî nimûneyeka yêkane ye û rûfiroş e. Di vê pirtûkê de Arifî hinerê rastnivîsandin, zelalnivîsandin, spehînivîsandin û xweşnivîsandinê di nêv êk de stirhaye û xwendina kitêbeka li ser zimanî himbe ya romanekê hêsanî û tamxweş kiriye.

Welhasil bi zêdeyî, rastî û delaliya xwe ve, ev pirtûk, rûspîtiya her kurdêkê/a xwenas e; hegî hebin, xeletî û kêmasiyên wê jî »rûreşiya« Arifî ye!



ARIF ZÊREVAN

Bingehên rastnivîsandina kurdîyê

NEFEL

Tenstavägen 102, 1 tr

163 65 SPÅNGA – SWEDEN

tfn +46-(0)8-621 11 78

ESKERÊ BOYÎK

Payîza bextê min

Rê dijwar e,
xil û xar e
Roj e kin e,
Hewas qar e,
hesîn jar e
Sebir tune,

Jiyan serê riya
maşyayî

Derd bê bin e,

Ez dareke
pelweşyayî,

Ev payîza bextê
min e!
1997



Wê gundê me xerab bibe

SULÊMAN ALÎ



Şemsê têra xwe tolîk da hev, pêşmalka xwe tije kir, bi buxçikî girêda û di ser milê xwe re avêt ser pişta xwe, û destekî ji pêşî de, di ser sîngê re, girêka pêşmalkê girt û xwest êdî bi rê keve. Çavên bi aliyê rêka ko dê ew bide ser, çûn mîna ko ew çav bixwazin bizanibin bê hîna ew rê li cîyê xwe ye yan na. Rê li cî bû û reşê mirovekî jî tê de xuyanî dikir. Şemsê ew mirov nas kir, di ber xwe de tif kir û di dilê xwe de got: "Ne bi xêr".

Tolîkvanê ne neheq bû. Bi rastî jî peydabûna wî reşî, wê sibehê, li ser wê rêyê û hatina wî ya bi aliyê jinikê

ve, ne jî xêrê re bû. Şemsê gav bi aliyê gund de avêtin.

Helbet her ko diçû nêzîkî wî reşî dibû. Reş, reşê gundiyeke bû, navê wî Salih bû. Ji mêj ve Şemsê fêm kiribû ko awirên wî ne paqij in, lê rû nedida wî. Berî ko herdû gundî bi heft-heşt gavan bigihên tara hev, Saliho bang kir:

- Şemsê! Tu jî ku tê vê sibê? -Heya ko Saliho pirs xwe kir, gavên di navbera wan de kêmtir bûn- Siba te bi xêr!

-Xêr silamet. -Şemsê silav vegerand- Min got berî dunya germ bibe ez herim jî zaryan re şîvek tolîk bînim.- Û destê xwe yê di girêka buxçikê de wa livand mîna ko tolîka xwe ray wî bide, lê hişê Saiho li dereke dî bû, wî li Şemsê guhdarî nedikir:

- He tolîk?.. E..Tolîk baş e. Saliho devê xwe dibir-dianî, nizanîbû çawa xebera xwe bibêje. Şemsê fêm kir ko xeberin bi cîranê wê re hene, rabû pirs kir:

- Xêr e cîran, çi heye?

- Ma çi xêr çi hal? Wê îro gundê me xira bibe.

Şemsê di cîyê xwe de sar bû, kabokên wê sist bûn û bîstîkekê deng jê hat birîn. Tenê wê li çavên Saliho dinerî da fêm bike bê gelo ew henekan dike yan rastiyê dibêje. Saliho pirs di çavên wê de xwend û peyva xwe zelal kir:

- Erê bi xwedê. Bi kêmanî dê îro çar-pênc zilam ji gundê me bên kuştin, heya tu bibêjî bes dê xwîn birije.

- Xwedêyo sitar,- Zimanê Şemsê geriya, lê kabokên wê ji tirsê dirikrikîn.- Kê ji te re got Saliho?
- Kesî ji min re negotiye, ez dizanim.-û ji bo ko tirsê şemsê zêdetir bike, peyva xwe ducar kir- Wê îro li gundê me xwîn were kabokan.

- Xwîna kê? Xwedêyo tu bisitirînî. Wê kî kê bikuje?

- Gundî, gundî xwe bi xwe, dê hevûdû bikujin, belkî ez jî bêm kuştin, mêrê te jî bêm kuştin..

-Ehmo?- Tirsê bi carekê pîreka reben girt, destên wê sist bûn, buxçik filiftî, li erdê ket, qidûmên wê şkestin û wê jî li pey buxçika xwe, xwe berda xwarê. Ya sitar.. Ya sitar.

-Kî zane? Belkî guleyek li birayê te jî keve, di şer de pîvana derbê nîne Şemsê!

Şemsê nema bersiva Saliho dida, tenê polepola wê bû û destê xwe li serê xwe dixist, fikir hawar û digiriya:

- Birayê min î reben, çima ji bo xwedê, gunehê wî çî ye, çima, hewar, çima..?

Hewşakî baş giriya, kir polepol û piştre serê xwe bi aliyê gundê sibehê ve hilda û pirsî:

- Ê ka çima dê şer çêbibe, ji ber çî?
- Ji ber te, ji ber te dê şer çêbibe- Saliho bersiva wê da.

Tolikvaniyê xweziya xwe daqurtand, ji tirsê û ji ber zuhabûna qirikê qêrîna wê nizim derket:

- Ez? Ji ber min?

- Erê ji ber te, tu yê bibî sebeb kuştina ewqas zilaman!

- Ez?-Tu peyvên dîtir bi Şemsa reben re der nediketîn- Çima ez?

- Ma tu nizanî çima? Va niha sibe ye û li vê çola xalî ez û te bi tenê ne û ez ê niha dawa carekê li te bikim. Tu nadî min û tu yê bikî hawar û biçî gund. Zilamê te li tevî bira û pismaman dê bêne pêşiya min, min bikujin.

Merivên min jî dê çekan rakin, herin heyfê, dê mêrê te bikujin û ro naçe ava dê termên me li nava gund bêne dirêj kirin.

Piştî zelalkirina pîrsgirêkê, kêlîkekê herdû bêdeng man, hêsirên Şemsê sekinîn, lê hêjî laşê wê dilerize.

Saliho jî di ser wê re sekinî bû, lê dinêrî.

Hilma wê zû diçû û dihat û pê re sînga wê jî bi lez bilind dibû û dadiket. Weşa wê sînga ciwan hestên Saliho hîna bêtir tev radikirin û daxwaza wî germtir dikir û wî xwest bersivê bigire:

- Te çî got, ma ne tu yê bibî sebeb? Piştî hinek bêdengî Şemsê bi tirsê pirsî:


- Ê.. Eger ez deng nekim dê çî bibe?

Wê gavê Saliho fêhm kir ko ciwanik teslîm bû.

Wî li derdora xwe nerî ka kes heye yan na û rabû bi destekî buxçika wê ji erdê rakir û bi destê din bi destê wê girt, ew li pey xwe kişand, ji rê derxist û got:

- Heger tu deng nekî, tiştê nabe, ne kes tê kuştin û ne gund xerab dibe.

Sema, govend û dîlan



Beşîr Botanî

Ji destpêka jîyanê ve, anko berî peydabûna mirovî, sema û govend hebûn. Nexasim heger em li dirinde, firinde û masiyan binêrin, yên ko bandora wan li mirovî gelek e û bê ko ew pê hest bike. Lê dîlan piştî peydabûna mirovî peyda bûbû, ji ber ko ew ji helbest, govend û semayê pêk têt. Sema û govend ji çend livînan pêk têt, zarok bi yariyan xwe fêrî livînan dîkin, anko ew xwe fêrî sema û govendê dîkin. Wisa piçûkên dirindeyan jî bi vî awayî fêr dibin. Corên sema û govendan mişe ne, sanahî ye ko mirov wan binase û çî ji aliyê livînan ve, yan jî aliyê rîtm û awazan ve jî hev cuda bike; wek sema û govendên folklorî, semayên dîskotêkê û balêta klasikî...

Sema, govend û dîlan huner in, li şahî, cejn û perestgehan têne bikaranîn. Wîsan nîzîkbûnatolazên 12-15 salî jî hevdu bi xwe bi ûşta wan, yên ko hewesa evînê jî wan re peyda dîkin. Hema jî ber hindê melayên kurdan sema, govend û dîlanên reşbelek (nêr û mê) berbend dîkin. Neteweya me bi sema, govend û dîlanan

dewlemend e. Ji ber coşbûn û ciwaniya wan, hemû gel û neteweyên rojhelata navîn pişkek yan bêhtir li şahiyên xwe bi karanîne, li radyo û telefzyonan jî tomarkirine. Min ev rastî li geşt û geryana xwe li hemû rojhelata navîn dîtiye. Bi kurtî dîmeneke ciwan e û karekî hêja ye ko



sema, govend û dîlanên me jî aliyê kom û orkstrayên gel û neteweyên din ve têne pêşxistin û pêşkêşkirin. Ev cêj nuho li hemû welatên Ewropayê jî belav e. Herê, li pişkek jî insfîtût, komele û xwendengehên hunerî sema, govend û dîlanên kurdî jî têne xwendin û pêşkêşkirin. Bi kurtî û bi rastî pisporek, ko bi vî karî dirabin, yekek jî wan ne kurd e. Nimûneya her ya bilind û giranbûha Balêta Gayana ya Aram Xaçatûryan e. Ciwantirîn û coştirîn sema û govendên vê balêtê, semaya Eysê, govenda lawên kurdan û semaya şûran in. Ev balêt li Sovyeta kevin jî 1942-1957 mişe caran ya hate pêşkêşkirin. Nuho jî bûye vîdeo, lê kêmbelav bûye. Nimûneya duyê koma Turkmenstanê ya folklorî, ya ko sala 1942an hate damezrandin. Ev kom sala 1981 hate Swêdê û pişkek jî berhema wê govenda keçên kurdan bû. Nimûneya siyê koma El-Reşîd ya jî bo hunerên erebî û kurdî li Bexdadê ye, serokê wê ermeniyek bû. Vê komê çend kevalên (tabloyên) ciwan li televizyonên Bexdadê û Kerkûkê pêşkêş kirin. Nimûneya çarê koma Davul ya xortên tirk û swêdiyan bû, serokê wê Eyûb Çurha bû, ew nijadsuryanî ye. Sema û govenda bi navê Galoc -Adiyaman ewî bi xwe dirist kir. Ev keval sala 1978 li televizyonên Swêdî, Almanî û Amêrikayî jî hate pêşkêşkirin...

Babetê sema, govend û dîlanan, bi hemû tayên xwe ve hêja û balkêş e. Lê mixabin e, ko tiştin ji vê hunera berkevî hatine guhartin, yan livînek, yan bendek û bêhtir jê kêmbûne. Ya rastî, divêt em şahnaziyê bi hemû hunerên xwe bikin, wê kom bikin, vekolin, çap bikin û biparêzin. Ma ne mixabin e ko hizrên (wek peyv, livîn, rîtm, muzîk... bab û bapîran bi beravê de biçin?! Êdî karekî pîroz e heger em pişkekê ji hunera devera xwe



kom bikin, ew jî da rojekê bêne pêşxistin... Nimûneyeke piçûk, koma Metîna ya xwendekarên Kurdan li Bexdayê ye û berpirsiyarekî wê rewsênbirê nemir Ehmed Salih Silo (1951-1991) ye. Ev kom di navbera salên 1970-1974 mişê caran jî bo vejandina sema û govendan li Bexdayê pişikdar dibû, wê kevalên hêja pêşkêşî televîzyonên Bexdayê û Kerkûkê dikirin. Nimûneyeke din, koma Heft xuşk û heft bira ye, li bajarê Kestelê ye, ko li ser çiyayê Sehyonê dikeve, ev bajar tenê yê kurdan e. Ev kom li piraniya aheng û mihrecanên îsraîlî pişikdar bûye, ta nuho jî maye û endamên wê jî hemû pîr bûne...

Vêca ez jî di vê vekolînê de berhemeke piçûk ji we re kom dikim û pêşkêş dikim. Bêguman bab û bapîrên me gencîneyeke fireh jî me re saz kiriye û vehandiye. Ji lew re ez bi şahnaziyê vê gencîneyê vedikim û buhayî didime wê, da komên me yên hunerî jî li gor karîna xwe pûte bi vê hunera berkevî bidin. Belê, rast e ko peyvên dîlanan sivik û sanahî ne, awazên wan bi sînor in (3-6 deng in), anko têr nakin, belkî bersiva demê jî nadin. Lê ji hinekan re jîyan e û her tişt e. Girova vê dîtinê dema zimanzanê nemir hêja Sadiq Amedî gotiye, ko 'Bêguman dê

demeke nekêm di şeyhanê, govend û dîlanan de borînin, da xwe ji bîrbiken, dilgeş û bextyar bibin, bêne ser hêj û vejena xwe, ji bilî seyran û geşt û geryanên bihar û payîzan...! Di ser hindê re, rewşenbîrê cuhû kek Şefîk Selman, yê ko li radyoya Êrşelîm-Qudsê pişka erebî kar dike, wî li Îsraîlê 1986 gote min ko govenda kurdî xemrevîn e, mirov pê difire cîhaneke din. Kurd bi govendê erdî dihejînin... Carekê min gote wan, ko hişyar bibin, da xanî bi ser me de nekeve.

'Dîlana kurdî ciwan e û li ba min hêjatiîrîn babet e'. Wisan hunermendê şehîd Memo Berazî (1967-1986) gotiye...

Çend corên sema, govend û dîlanan:

- 1- Yên keç û jînan, Kevokê, Gulşênî, Xemriye, Wesê, Pêşpaş, Gulê, Temzere, Hêdî, Were-were û hd.
- 2- **Yên zaro û tolazan, Aşokê, Hûrzê û hd.**
- 3- **Yên kur û mêran, Ceng, Mîro û h.d.**
- 4- **Yên reşbelek (nêr û mê), Şêxtanî, Delîlo, Bablekan, Govend, Şêran, Baso, Hejandin, Sema, Yarê, Keval û hd.**

Aşokê

Folklor: **Botan**

Govenda Aşokê

Aşokê ha Aşokê

Aşoka roman

Aşokê ha Aşokê

Destmala xortan î

Şîrînê şenamokê

Aşoka romanî

Şîrînê şenamokê

Destmala xortan î

Delalê xalxalokê

Aşoka romanî

Delala xalxalokê

Destmala xortan î

Şahya me li Zaxokê

Aşoka romanî

Şahya me li Zaxokê

Destmala xortan î

Ha Aşokê, ha Aşokê, ha Aşokê romanî

Aşokê ha Aşokê, Aşoka romanî

Aşokê ha Aşokê, Destmala xortan î

Aşokê dîsa dîsa

Aşoka romanî

Aşokê dîsa

Destmala xortan î

Kulîka nav garisa

Aşoka romanî

Kulîlka nav garisa

Destmala xortanî

Fîncana dest ûrisa

Aşoka romanî

Fîncana dest ûrisa

Destmala xortan î

Keça sû kir her wisa

Aşoka romanî

Keça sû kir her wisa

Destmala xortan î

Ha Aşokê, ha Aşokê, ha Aşokê romanî

Ayşokê ha Ayşokê, Ayşoka romanî
Ayşokê ha Ayşokê, Destmala
xortan
Ayşokê çima çima?
Ayşoka romanî
Ayşokê çima?
Destmala xortan î
Kulfilka nav genima
Ayşoka romanî
Kulfilka nav genima
Destmala xortanî
Fîncana dest hakima
Ayşoka romanî
Fîncana dest hakima
Destmala xortan î
Keça şû kir her tu ma
Ayşoka romanî
Keça şû kir her tu ma
Destmala xortan î
Ha Ayşokê, ha Ayşokê, ha Ayşoka
romanî
Ayşokê ha Ayşokê, Ayşoka romanî
Ayşokê ha Ayşokê, Destmala
xortan
Ayşokê hêra hêra
Ayşoka romanî
Ayşokê hêra
Destmala xortan î
Kulilka nav şkêra
Ayşoka romanî
Kulilka nav şkêra
Destmala xortan î
Fîncana dest camêra
Ayşoka romanî
Fîncana dest camêra
Destmala xortan î
Nizanim tu ji kê ra
Ayşoka romanî
Nizanim tu ji kê ra
Destmala xortan î
Ha Ayşokê, ha Ayşokê, ha Ayşokê romanî
Ayşokê ha Ayşokê, Ayşoka romanî
Ayşokê ha Ayşokê, Destmala xortan î

Zave ye

folklor: Botan
Govenda Şêxanî

Zava ye lo, zava ye
Îro kovan zava ye
Zava ye
Delal e, malava ye

Şahî ye lo, şahî ye
Li mala me şahî ye
Şahî ye
Xoşî bê dûmahî ye

Seyran e lo, seyran e
Li nav dara seyran e
Seyran e
Mast û pîvaz û nan e

ŞAREZAYÊN TARİSTANÊ



SELİM BEQERÎ

ŞAREZAYÊN TARISTANÊ

BEŞÊ YEKEM

Mele **Bênav** kurê **Koçerê** hewl da ko wek her gav giran xwiyani bike. Bişiri lê bêyi ko lêvên wî ji ser hev biçin û diranên wî yên mezin û xurt diyar bibin. Destên xwe bilind kirin, û bi kurtepiştî **FATÎHE** xwend. Çend zilamên ko li civata wî bûn xwestin xwe bi çend gotinên vezilyayî yên pesindanê pê şelaf bikin, lê guh neda wan. Hêdî hêdî rabû ser xwe. Sicadeya xwe raxist û du riketên dirêj ên nimêjê kirin, di nav re kurtepiştên spasiyan û peyvên pesinandinê kêmtir bûbûn. Dema ko nimêja xwe kuta kir; sicadeya xwe pêça. Pêlava xwe ya lastîkî li xwe kir, ji derî derket û berê xwe da meydana percankirî.

Meydan berfireh e. Li başûrî wê ko "Mele **Bênav** bixwe jî li wir bû odeya mêvanan bi cî dibe, li rojhilatî meydanê çend odeyên bi hevûdû ve, bi dergehên xweser ko li meydanê dinerin, hatine ava kirin. Li başûrê rojavayê meydanê axûr û li teniştê pangaveke piçûk ko banê wê bi sajeke pêlpêlî û rût hatiye nixumandin. Ji boyî tenûrê cihêkirine.

Mele **Bênav** berê xwe da odeyekê û li pey xwe zencîrek ji şopine zer li ser berfa tenik hiştin. Ji nişkê ve rawestiya û bi qasî du metreyan dûrî deriyê axur berbi milê rastê ve zivîrî. Di xefkekê de terperepa çûkekî bû. Xwe çemand û bi dilovanî rahişte çûk. Kurê wî **Ziwan** ê ko berbi wî ve baz dida bang kir: "Yabo, îro ev ê didiwan e". Mele **Bênav** devên xefkê sist kirin û çûk bi xwe li bakirin firiya. Kurê wî bi matmayî devê xwe vekir, bavê wî bi lez pê ve giha: "Belkî me qencîr kir kurê min. Ez ê li te vegeřinim", û liyreke hesinî giran ko di berfê de winda bû jê re avêt, kurik jî bi kêfxweşî ew bi kulma xwe ji bin qata spî derxist, kulma ko bi gîhayê hilkirî yê di bin qata spî de mişt bûbû. Bavê wî rîya xwe berdewam kir û derbasî odeyekê bû. Derket û kêrek dirêj di destê wî de bû û berê xwe da axur. Berxê pêşîn bi bazdan ji axur derket û bi ser berfê de ket. Yê didiwan li pey hat, û yê sisiyan, yê çaran. Hemî bi bazdan derdiketin û bi ser berfê de diketin. Radibûn ser xwe û li dora xwe dizîzikîn, piştîre dîsa diketin, diketin û rişêşkeke sor û avgîrine sorî biçûk digel dûkeleke sivik li ser berfê nîgar dikirin. Mele **Bênav** bi

kêra xwe ya xwînbûyî derket, du zilam ve beziyan û kêr ji dest girtin, berê xwe dan berxan û dest bi gurandinê kirin.

Jinekê ji hêla odeyên ko li teniştê hev hatibûn ava kirin lîland, Mele **Bênav** destê xwe bilind kir wek nîşanekê da ko raweste, jinik rawestiya. “Hemî xelk lawikan tînin, ez ne yê pêşî me“, wisa got û berê wî li odeya mêvanan bû. Li ber asîtankê pêlava xwe ji lingê xwe kir, û derbas bû. Zilaman jî li teniştê sopeya dadayî ya mazotê cihê jê re vala kirin. Mele **Bênav** cihê xwe xweş kir. Bi awireke nerm û bi ser hejandin li milê xwe yê çepê zivirî û piştê li milê rastê, mîna ko bi spasîyeke nehênî bersiva pîrozbahîyan dide. Destê xwe avêt qutiya zivînî a neqîşandî ya tûtînê û radestî yê li teniştê xwe kir. Careke din piştî ko qutî lê vegeyriya li ser berê bi bizaveke sivik qutî zîzikand û avêtin ji zilamê li hemberî xwe re yê li paş sopeyê. Qutiya tûtînê di odeya mêvanan de diçûn û dihatin. Her kesê ko qutiya xwe bavêta ji yekî re wî yekî jî qutiya xwe jê re davêt. Ji kaxezine tenik û tûtîneke hêwî û bi gelek tiliyên ko bi şarezayî û bê şaşîti bi pêçanê mijûl in, cigareyên zirav û cigarene qalind tên pêçan.

“Melê me yî hêja ma tê çi navî lê bike“ yekî ji mêvanan jê pirsî. **Bêkes** mîna ko ev nav ji mêj ve amade kiribe Mele **Bênav** bersiva wî da. Yê ko jê pirsî xwest piçekî dilê wî xweş bike çunkî navê **Bêkes** ew tevlihev kir: “Ma çima **Bêkes** seydayê me, hemd ji xwedê re ko malbata we malbateke mezin e?“ Mele **Bênav** lê vegevand: “Ji bilî berxên mirov û mala wî û genimê wî eger carcaran wî nexapîne û wî rût nehêle, kesî kesan nîne“. ev bersiv bi ber serê yê ko ji Mele **Bênav** pirsî bû neçû, lewra bi zimanê xwe xwe bi pêçana cigareyê mijûl kir, keviya kaxezê şil dikir da ko bi hev ve bizeliqin.

Di odeyên li teniştê hev de, li rojhilatî meydanê, jin di derîkî re derbas dibûn û ji derîkî din derdiketin. Hemî mijûl in. pêçek û paçên spî, û mersefên nanê şilikî bi kêfxweşîyeke hilyayî mîna berfa ko li ber şopa lingan dihile bi wan re di nav dergehane de diçin û tînin. Lêbelê ew pangava di navbera wan odeyan û axur de, pangava spî ya ko tukes nehingîviye rûçikê wê, ko zarokan li wir xefkên xwe veşartine û ji bilî piçikên nan tutişt ji wan nexuyaye, di wê pangavê de, çûk diçin û tînin û piştê berbi beştên li dervemayî yê banên xaniyan ve difirin, di sawa tirsê de ne, bi taybetî piştî terperêpa dû çûkan a li ser piçikên nanê şilbûyî yê di xefkan de. Lê eger piçekî bi hûrbîni li ser çirokê rawestiyana dê bêyî tirs êrişî nan bikirana. Çunkî di berfê de piştî saetekê nan şil dibe û ji hev dikeve. Û nikul dikarin piço piço bêyî ko xefk biteqe nanî bixwin. Bi giştî rûdan wisa bû, wexta ko zarokan xefkên xwe demeke dirêj di bin berfê de dihiştin: çûkan bi hêsani û bêyî ko devên xefkê bêne girtin nanê xwe dixwarin, bi hêrs dev li tiliyên xwe dikirin, û ji paş camên pencereyên xaniyan ên ko li meydanê dinêrîn diqîriyan: “De stûyê wî bişkîn hey ehmeq“, û xefk jî wek ehmeqekî bêdeng dima. Zarokan jî nikaribûn her kêlikekê nanê xefkan biguherînin, çunkî şopa lingên wan li ser berfê pirî caran çûkan dûr dixîne, lewra bendemanê dikin da ko şopa lingên wan yekcar bê

niyumandin, lê li vir eger berf bi barîna xwe sînoren pêwistiyê derbas bike alozî dest pê dike.

Wext. Ax. bo nan û genimê xefkê wext, û ji bo mele **Bênnav** jî wextê têramandinê. Saet neh û nivê sibê bû. Hêdî hêdî gulîne dawîn ên berfê bi tembelî dibarin, çend çiq xwe ji têla elektrîkê ya ko di ser meydanê re derbas dibe, bernadin, perên xwe nepişandine hetnî ko qirikên wan di reşê damdamî de winda bûne. Li derve; li ber dergêhê textînî kûçîkek li ser herdû lingên xwe yên dawîn rawestiyaye û di terkên derî re li iyaran û li hûr û roviyên avêtî yên berxan temaşe dike.

Berî her kesî cîranên mele **Bênnav** hatin. Nêzî berbangê jina wî ket ber pîrikan, Pîreka aşûrî ya ko ji êvarê de dizanîbû ko êdî roja wê ye, sibehê zû digel mêrê xwe hatin. Mêrê wê jî di nav zilaman de "Bajarî"yê bi serê xwe bû; ji ber ko li cem wan, her kesê panteron û çakêtan li xwe bikin bajarî ne. Mele **Bênnav** li tenişta sopeyê kursiyek pêşkêşî mêvanê xwe kir, lê yên mayî, li ser bera neqîşandî bi kurkên xwe rapêçayî cihên xwe xweş kiribûn. Mele **Bênnav** bi destê xwe qutya tûtînê ya zivîn dirêjî mêvanê xwe kir, yê aşûrî lêbûrîna xwe xwest, ji ber ko nizane cigareyan bipêçe, lê .bi herhal- ew cigareyên pêçayî yên qûnpenbo çêtir dibîne.

Dê yên dûr û yên nêzik bèn, mele **Bênnav** wisa dirame, ew raman jî piçekî wî bînteng dike. Ew bi xwe ewqasî guh nade mêvanên ko dê ji vî bajarê biçûk bèn çunkî barê wan ne giran e, lê ya ko wî ji qidûm dixîne kesên ko dê ji gundan bèn û dê çend rojekî di vê rewşa aborî ya tenik de mazûbaniya wan bike. Havîna çuyî pişta wî şkenandibû. Bi qasî bihustekê jî simbil ji erdê bilind nebûbûn, nehatin çinîn, ji bo çêrê hatin berdan. Navdariya wî bi şûn de vedikişe, û cih jî teng dibe. Çend berx ser jê kirine û çend berx dê ser jê bibin; dest pê kir û wisa ramiya, dê çend kîsên ard têra mêvanan bikin, û çend nivîn dê bi lingên ko bi lîlavê hatine şuştin û bi heriya ko derbasî pêlavan bûye qirêj bibin. Mele **Bênnav** bi bîntengiya xwe ya herdemî serbilind e; bîntengiya ko kêfxweşiyê têkelî xwe nake, piçekî xwe paye dike da tiştê ko maye biparêze.

Berî niha, guh nedida her tiştê ko di hundirê mala wî de çêbûba. Digel ko li wir bû jî lê ne li wir bû. Sê parên rojê li "Bazarxaneyên bazirganan" bû- Çend odayên li kêleka hev ko bi navê "Bîroyan" dihatin nas kirin. Her odayek bi çend kursiyên ji qeselan û bi maseyekê ko çend celebên genim li ser wan bûn, raxistî bû, banên wan ji çimintoyê bûn û li jora bèn kulekine biçûk û bi camine qalind hatibûn vekirin- Û para dawîn a roja xwe li malê bû. Parek ji rojeke dirêj ko digihişt êvarê û beşek ji şevê jî, ne ko bi malbatê re û bi kar û barên wê re diqetand, lê ew jî bi mêvanên xwe re, mêvanên ko dihatin da peyvên rojê yên li ser bazirganiya xwe berdewanm bikin.

Bêguman; havînan kar pirtir dibe, her tiştê ko li "Bazarxaneyên Bazirganan" kuta nebûye li meydana malê bi dawî dibe. Dergêh vekirî dimîne, ajovanên kamyonên

barkirinê diçin û têt. Barên genim di cî de ji çinînê berbi kamyonan ve diçin. Barkêş diçin û têt. Hin ji wan bi hinin dîtir re têt guhertin, û yên mayî jî heq destên xwe distînin. Çengên genim wek nimûne di keviyên dismalên rengînî yên zilaman de têt, da ko yê çêtirîn hilibijêrin. Zilamine ji Gumrikê jî bi wan kesan re bi dizî derbas dibin da ko pişk û parên xwe wergirin û çavên xwe li hin tiştan bigirin.

Lê payîzan rewş tê guhertin: Dest bi gera li kirêkirina zeviyên berhemdar û traktorên cotkirinê û tovên navdar, dibe. û di zivistanê de çavdêriya baranê dikin. Biharê hemî çav dest pê dikin û bi bazarxaneyên genim ve têt girêdan; bi êrişên seqemê ve û bi xwediyan derasan ve ko ji hilibijartina karkeran û tebax dest pê dike û bi peydakirina ajovanê erbaneya guheztina xwarinê bi dawî dibe.

Berî niha guh nedida rewşa mala xwe, her tişt ji ber xwe bi rêk û pêkî derbas dibe. Her kesê ko xwedî saman be kar û barên wî ji ber xwe ve bi rêk û pêkî derbas dibe. Jinên cîranan ji bo malbatê nan li tenûrê dixînin da ko çend çewlên genim bo qûtê zivistanê qezenc bikin. Goştîroş ji ber xwe ve tezetirîn goşt hildibijêre û bi destê xwe digihîne malê. Zarok delalî ne, merivên ko hene di vê delalîkirinê de da ko razibûna jinê bi dest xînin cirîdê dikin, jin jî bêguman dê ji wî re bibêje ka kî pitir hêjayî alîkariyê ye, hetanî dara zeytûnê ya bi tenê ya li hewşa malê ya ko serê heft salan ji metreyekê wê de dirêjtir nebûye dê hinekan bibîne ko axê ji dora wê bimalin. Lêbelê mele **Bênaw** vekêşaneke mezin di gorepana mijûliyên xwe de dibîne, ko ne li dijberî malê be nema xwe dibîne: Kuro ji bo çî tu bi pêlava xwe ya gemarî pêl keviya sicadê dikî?“, û dema ko zarokê tirsyayî bersivê nade wî silakê li bin guha dixê. “ Ev kê ji we debwa sopê ji bîr kiriye û ji nû ve danegirtiye?“, wexta ko tu kes bersivê nade pehînekê li sopê dixê, sope diheje û dûman ji movikên loleyên mezin ên ko berbi bîr ve diçin dipijiqe. “ Hey kero derî li pey xwe bigir. Bayê sar xanî dadigire“. “ Qîjeqîja vî lawikê har rawestînin“. “ Bîna savara şewitî tê min. Keçê ma tu guh nadî xwarina xwe?“. Ker in. Malbatek e ji keran in“.

Bîntengiya ko heye berê xwe dide bêgunehan, ew bi bixwe jî vê yekê di aramiya xwe de hest dike; aramiya ko di wexta vekirina defterên hesêb de hevalbendiya wî dike; defterên ko ji ber lêtemaşekirin û girtin û vekirinê ji hevûdû veçiriyane. Li dora xwe bi dilovaneyeke ko bi lêbûrîneke bêdeng têkel e li rûyan dinêre; rûyên ko eger ew bîna xwe nekişîne bîna xwe nakişînin û eger ew nebişire nabişirin, jixwe ew tu carî nabişire, lê bi awrira xwe li defterên xwe dizivire, ko hesabên wî bi pênuşa darîni nivîsandîne.

Her tişt hatiye rapêçan, tenê hejmarên ji zîvê vekirî mane.“ Ev hesab ê kê ye?“ carinan bi kurtepiştî ji xwe dipirse, demeke dirêj da ko bersiva xwe bide dirame : “Ax“. Defterên wî di mezinbûnên xwe de cihê cihê ne: Hin biçûk in bi têline zivirokî ji bo bîrkan in, hin orte ne bi çarkoşeyên şîn in, yên mayî jî mezin in, bergên wan qalind in û şûna tiliyan li ser wan hatiye kolan .. Mele **Bênaw** li tişteki digere, tişteki ko ji hişê wî filitiye û bûye hejmarek. Kî dizane.

Bihêhal, ev sibeh ne wek hemî sibehên dîtir e, îro hejmara pêncan di zencîra nijad çêkirinê de hatiye, ew jî law bû, bi kêmanî di serê bavê xwe de bi navê **Bêkes** hatibû bi nav kirin. Renge mele **Bênaw** bi vê dana teze hinekî kêfxweş be, lê berf sedîsedkirina vî tiştî aloz dike. Rabûn û rûniştin, pêşwazî û bi oxirkirin, dergeh vekirin û di her vekirinekê de derbasbûna sireke bayê qerisî tiştine wisan in ko tu carî mirovan kêfxweş nakin.

Kêlik bi kêlik, bi belavbûna rojê re ev erka lihevhatî mezintir dibe, ereka ko bi kuxikeke sivik tê birîn, ew jî ji ber çûn û hatina wî ya di navbera dergehê sar û sopeya dadayî de ye.

Di Saet deh û heft deqan de, ne kê m û ne zêde, ango di wê kêlika ko mele **Bênaw** cara pêşîn li saeta ko bi zincîreke zîvînî bi pişkokekê ji pişkoken yelekê wî ve daliqandî bû de nêrî, “ Girzo ” lawê wî yê mezin ji ber derî nîşanî wî kir ko êdî nêzik bibe da ko pê re bipeyive, lê **Bênaw** guh nedayê û qiseyên xwe bi mêvanekî re berdewam kir. Lê wexta ko lawik ew bi nîşanên bêdeng nixumand, bavê wî bi giranî wek adeta xwe dema ko xelk rûniştîbin bang lê kir: “ Were, wisa wek cirdî xezalan li ber derî nemîne, te em qwfilandin ”.

Kurê mele **Bênaw** nivê jorîn ê laşê xwe derbasî hundir kiribû û lingên xwe da ko pêl keviya berê neke li derve hiştibûn. Aniha divê ji bêçareyî pêlavan ji xwe bike, lewra piştî ko herdû paniyên xwe baş li asîtankê xistin da ko lingên wî jê derkevin; belkî herdû pêlavên lastîkî teng bûn, û li ser tiliyan derbas bû. Li teniştê bavê xwe qelêviska rûnişt û di guhên wî de li paş dismala spî ya ko bi ser guhên wî û qirika wî de berdayî bû bi kurtepiştî çend peyv jê re gotin. Mele **Bênaw** bi guman û tirs li lêwik temaşe kir, li mêvanan nêrî û ew guman bi bişirîneke kawikî ji ser rûyê xwe hilanî, lê mêvanên wî bi peyvên xwe mijûl bûn, lewra, ew guhertinên rûyê wî, nedîtin. Nîşanek da lawik ko derkeve, lawik derket. berî ko rabe ser xwe û bi pey şopa lêwik keve, bi qasî du deqîqeyan mit û mat mabû.

Li derve mele **Bênaw** dît ko hemî jin diçin odeyeke dîtir ne ko diçin odeya jina wî ya ko gerek bi kurê xwe yê nûhatî re be. Û xuşka xwe ya ko roja xwe ji bo aîlkariya wî terxan kiribû, dît ko çawan li ber derî rawestiyaye û bi nermî berê pîrekan dide odeyên dîtir: “ Tikaye hûn biçin wê odê, rewşa **Brînayê** ne gelekî durist e ” lêbelê hêrsek di rûyê wê de dixuya hema hema dihat ko bifilite, wexta ko birayê xwe ji dûr ve dît bêyî ko çavên wê bikutkutin ziq lê nêrî; bi wêneyekê ko li ser bibikên çavên wê mîna başokê diçurusî matmayî bû. Mele **Bênaw** jî ziq lê nêrî da ko rastiya peyvên kurê xwe berya ko xuşka wî bipeyive di rûyê wê de bibîne.

Nêzik bû, hetanî hema wextî bêvila wî bihingivîya bêvila xuşka wî. Guliyên berfa spî yên bêhêz yên ko bi çavpanî bi ser ebrûyên wan de ketin , çavên wan nekutkutandin. Destê xwe avêt destikê derê, wê jî çavên xwe bi alî destên wî de, berbi wê bizava hêmin a ko piştî kêlikêkê dê wan destan bilerizîne, zîvirandin.

Dergeh dehf da lê hêjî ji paş milên xwe li xuşka xwe temaşe dike. Derî li pey xwe girt û awirên xwe li odê gerandin: Jina wî li ser doşeka li ser berê ye, li nêzî wê, di heman doşekê de, kurê wî yê nûhatî hetanî dawiya serê xwe nixumandiyê û ji zarokêki mezintir e. Di kêlîka pêşîn de wisa bawer kir, lêbelê kêlîka wî ya pêşîn nixandina wî ya mezinbûna laşan şaş dernexist. Li ber keviya berê pêlava xwe ji xwe kir û bi pêş de çû. Jina wî bi westaneke diyar lê nêrî, westanek ko bi dudiliyeke seyr têkel e.

Li tenişt doşekê li ser kabokên xwe rûnişt û herdû keviyên kurkê xwe yî qalind bi ser rehnên xwe de kişandin. “ Halê te çawa ye?” jê pirsî, wê jî her bi wê westanê ziq lê nêrî, lêbelê lêva wê ya jêrîn du caran lerizî, wî jî awira xwe ji ber wê da alî û bi hûrbînî li lihêfa li teniştê wê temaş kir, hêdî hêdî, destê xwe avêt serê lihêfê û kişand, porekî reş û dirêj xuya bû, piçekî din kişand, eniyeke gulreng û piçekî tîrş xuya bû. Bîbikên mele **Bênaw** fireh dibin, destên wî dilerizin. Eniya xwe qermiçand û bi kurtepiştî çend peyvên ko nehatin bihîstin gotin, û lihêf bi carekê ji ser rû kişand.

Nûçe ji odeya girtî ya ko xuşka Mele **Bênaw** li ber dergehê wê pasvaniyê dike derdikeve, û madtirşî rêça xwe berbi rûyên hemî mêvanan de dibîne. Pîrozbahî êdî aniha dibe babetek ji babetên çavpaniyê: “ Ma rast e seydayê me?”, beriya ko pirsî xwe kuta bike mele **Bênaw** dibêje: “ Dana xwedê ye cîran. Dana xwedê ye”.

Her nîv saetê mele **Bênaw** xwe dibîne ko berê xwe dide odeya girtî û bi rûyekî tîrştir derdikeve. Ji xuşka xwe dixwaze ko piço piço sînorekî ji mêvanan re deyne, û piştire dergehê hewşe asê bike da ko tukes derbas nebe. Û wexta ko xuşka wî wisa bi matmayî lê temaşe dike mîna ko jê dipirse: “ Em ê çawan sînorekî ji vê xelkê gişî re deynin?”, li ser piyan bersiva wê dide: “ Em nema li vir in, ji wan re bibêje ko nema li vir in”

Berfa bêhêz; ya ko bi hêminî ji ezmanekî şîrînî dibare, kêlik bi dû kêlikê de şopa çûn û hatinê dinixumîne. Çiq jî her li ser wan têlan in; têlên ko di ser xaniyan re digihêjin beştan. Tenê, çûk, piştî wê hêminiyê venegeriyan. Kurê mele **Bênaw** ê şeş salî nêzîkî wî bû û jê pirsî ko rê bidê da ji nû ve xefkên xwe vede, bavê wî bi dirêjahî ziq lê nêrî, bêguman di tu bersivê de nederamiya. Careke din lawik jê pirsî: “ Ma bi rastî çûk qeydkirî ne?”, mele **Bênaw** lêva xwe ya jêrîn çemand û ebrûyên xwe bilind kirin: “ Wisa dibêjin. Qeydine nediyar di lingên wan de ne, lewra xwe çeng dikin”. kurê wî jê pirsî: “ Ma kê ew qeydkirine, yabo?”. “ Xwedê kurê min xwedê, hebe tunebe dê gunehêki pir mezin ko hêjayî qeydê be kiribin”.

Nîvê rojê ye. Temenê lawikê nûçebûyî di navbera heft û heşt saetan de ye. Mele **Bênaw** derbasî odeyê dibe û li wir dirêj dike, xuşka wî li ber derî diçe û tê, pif destên xwe yê qeşagirtî dike, dibe ko carcaran radiweste da ko guhdariya derî bike, û bizava xwe ya asêkirî bi çûn û hatinê berdewam dike, û guh nade gurmegurmên ko her çend kêlikan ji dergehê hewşê tên.

Li tenişt tenûrê hêjî agir di bin dista mezin de dadayî ye. Dûkeleke tîr bilind dibe û tevî dûmana rêxa şilbûyî dibe, rêxa ko wek sûtemenî bi kar tînin. Pîrejinek bi darekî dirêj goştê distê li hev dixîne, û piştîre li ber êgir rûdinê da ko xwe germ bike. Ahenga xwarinê ye lê aniha mêvanên ko vê sibehê hatin û li vir amade bûbûn çî heyfe berya ko goştê berxan bikele winda bûne. Û li nêzî vê pêşwaziyê; pêşwaziya mêvanên ko dergeh ji wan re venabe, kurê mele **Bênav** bi ser berfa spî de kumişî bû û xefkên xwe pê dinixumandin.

“Min ev li kû dîtibû, hawara Xwedê?” wexta ko xuşka mele **Bênav** li ser rewşa hundirê odeyê pirsî ji xuşka xwe re wisa got. Û berdewam kir: “Ma tu bawer dikî, pê dizane ko şeva çûyî ez dereng mame û ez bi derengî ji xew rabûme û nimêja sibê li min çûye?”. Jê pirsî: “Ma halê diya zarokan çî ye?”. “Mit û mat e” bersiva wê da. “Aniha tu yê çî bikî?”. Mele **Bênav** serê xwe daxist û got: “Qedera wî ye, ma kes dikare qedera wî vegeirîne: Lê ya ko min ditirsîne ew e: ka dê çîrok li kû raweste”.

Di nav berfa meydanê re mele **Bênav** berê xwe da pîrejina ko xwarina distê bi darê xwe li hev dixist. Kurê wî ji wê koşeya li tenişt axur a ko ji xwe re kiribû rewangeya çavdêriya xefkan gazî bavê xwe kir: “Ha ji xwe hebe yabo, te pêl xefkekê kir”. Bi rastî jî mele **Bênav** guh neda teqeteqa sivik a xefkê ya di bin lingên xwe de. Piçekî li jêr nêrî, û meşa xwe domand.. “Ma halê berxan çî ye?” Ji pîrejînê pirsî, Pîrejîn bişirî lê bişirîneke qermiçî û got: “Aniha baş germ bûne, de ji wan re ji wê seqema axur çêtir e”. Û bi kurtepiştî pirsî: “û rewşa êgir?”. Ev bixwe ne pirs bû, lê hewldana qewirandina sîbera pirseke dî bû; pirseke bê bersiv. Wê çaxê, ew bixwe jî li ber distê rûnişt, û destên xwe li ber tîna ko ji guliyên zer derdiçû vekirin; guliyên ko binikên kevirî dialastin û bi şûn de vedikişiyan.

“Keko”. Dûr çûbû angû li ber wê tîna ko guliyên berfê yên li ser kurkê wî kiribûn wek tayên avê ko hêdî hêdî dadiwerfîn tevna reş, ne li ser hişê xwe bû. “Keko”... Vê cara diwemîn dengê xuşka xwe bihîst, bi alî wê de zîvirî lê hêjî rûniştibû. Xuşka wî lê temaşe nedikir lê li derî dinêrî, di cî de mele **Bênav** nas kir; kêlîka ko bendemana wê dikir êdî va hat.

Xortekî gulreng bû, porê wî reş û pir bû, riha wî baş hevûdû negirtibû, piço piço li çnd cihan şîr hatibû, ji derî derdikeve û destekî xwe daniye jora çavên xwe da ko wan ji ronahiya berfê biparêze û bi destê din çerçefa qalind a ko li laşê xwe pêçaye zeft kiriye. Bejin kin e, lê lihevhatî ye. Renge bîst û heft salî yan jî sih salî be. Bi cangiranî mele **Bênav** berbi wî ve çû û wexta ko gihîst nik wî jê re got: “Kurê min dê berf ziyane bigihîne çavên te”. Yê xort çavên xwe kutkutandin û got “Gerek ez gelek tiştên ko tenê wan bi hestên xwe nas dikim bibînim yabo”. Piçekî bédeng ma, çavên xwe li meydanê gerandin û got: “Kanîn birayên min?”. Mele **Bênav** bi alî xuşka xwe ve zîvirî û serê xwe jê re hejand, xuşka wî berê xwe da odeyeke nêzik, û berî ko vegere, mele **Bênav** û kurê xwe yê ciwan ji nû ve derbasî odeya dayikê dibûn û li teniştê wê li ser doşekê rûdiniştin.

Pîştî demeke kurt her çar zarokên wî derbas bûn, her çar law in, biçûkê wan çar salî ye û mezinê wan jî deh salî ye. Xuşka mele **Bênaw** şûna ko gerek lê rûnên li dora sopê şanî wan dikir, dest bi xirecireke sivik kirin û rûniştin. Lawikê biçûk jî nişkê ve bang kir: ((Ez jî dixwazim wek **Bêkes** mezin bibim)), yê jê mezintir pê re keyidî: “Devê xwe bigir”. Yê mezin jî bi hestê xwe û di wê matmayîna ko li ser rûyê bavê wî ya ko radestî wê bûye, dizane ko êdî rewş ne rewşa henekan e.

Mele **Bênaw** tu tiştî nabîne ko bibêje da ko hevnasînê di navbera her çar lawên xwe de ji alîkî ve û di navbera vî kurê nû jî dayik bûyî de yê ko her saetekê salan kurt dike ji alîkî din ve, hêsan bike. Dê bi kîjan serpêhatiyê dest pê bike da ko têgihîştinê hêsan bike, û li beramberî vê bûyera ko tucarî neqewimiye, û tu tişt di çesnê wê de nîne ji bilî pêximberê ko carekê di pêçekê de peyvîne mezin gotibûn dê xwe bavêje bextê kîjan diyardeyê? Awira xwe ya dudil di navbera rûyê jina xwe ya ko pişta xwe daye balgehê û rûyê xuşka xwe de diguhezîne. Û wexta ko bêçare ma, bi kurtepiştî got: “Ev birayê we **Bêkes** e.. Ew jî birayên te **Bêkes**“. Di wexta ko peyvên mele **Bênaw** mîna tingetînga ko ji tenekê bê tenik dibûn, yê xort li ser kabokan bi alî sopê de berbi birayên xwe ve çû. Bişirî, bîbikên çavan fireh bûn, destê xwe yê gulreng dirêjî porê birayê xwe yî biçûk kir, hem pê şa dibû û hem jî kêfxweş dibû, kurik jî serê xwe çemand da ko xwe dûrî wî destî bixîne.

Kurê mezin **Gerzo** wek birayê xwe yê biçûk xwe jî Bêkeşê seyr neparast û ne jî madê xwe jê xeland. Xwe li ser berê berbi wî ve kişkişand û ji **Bêkes** re got: “Ser sera û ser çava birayê min“, û destê xwe jî dirêj kir da ko silavê lê bike. Ev helwest; helwesta birayê mezin bû dergêhê şkenandina madtirşiyê; madtirşiya ko li ber tîna sopeyê germ bûbû. Hersê birayên mayî bi kurtepiştî gotin: ((Tu bi xêr hatî **Bêkes**“. Mîna ko dyik û bavê wan matmayîna xwe ji bîr kiribin, wa dixuye ko helwesta zîrek a zarokan ew xapandibûn, lewra bi hêrs dest pê kirin û ji wan xwestin: “De maçî hevûdû bikin, ev birayên te ne, ev jî birayê we ye, şerm e, wek biyaniyan kurtepiştê nekin, dengê xwe bilind bikin, erê, ha wisa“.

Zarokan fediya xwe hilanîn; fedyâ ko dê û bavê wan di kûrahiyên xwe de hilnanîne, çinku vî Bêkeşî piştî dusaetan ji ji dayikbûna xwe wêneya bavîtiyê bi ser hundirê xwe ve girtiye, hingê wexta ko nû çebû bavîtiya xwe ji bo zarokekî nûhatî hilanîn, lê ew li derveyî bavîtiyê mezin bû bi awakî ko tenê dudilî û matmayîn serkêşên hestên wan bin.

Dê û bav, tenê, çavdêriyê dikin. Hertîşt ji ber xwe ve pêvajoya xwe dibîne. **Ziwanê** ko xefkan vedide ji birayê xwe **Bêkes** re dibêje: “Ma tu ji nêçîra çûkan hez dikî?“. “Çûk?” bi pirsyarî **Bêkes** peyivî, “Ax. Berî hatina xwe min gelekî nêçîra wan dikir“, û bi bişirî li birayê xwe yê ko bi bersivê mat bûbû temaşe kir, û da ko dudiliya sist ji ser birayê xwe yê biçûk biqewirîne berdewam kir û got: “Me ne wekî te bi nê nêçîra çûkan dikir, lêbelê me xefk dixistin nav pelên daran û me

mêywe dikirin libokên xefkan". Piştî wê bersivê berê xwe da birayê xwe yê mezin Girzo û yê biçûk jî di pirsên wî yên lezokî de hişt: "Ji bo çî tu ji min napirsî çima ez wisa bi lez mezin dibim?". Girzo mîna yê ko ji xwe re pirsê bibîne devê xwe vekir lê **Bêkes** nehişt ko bipeyive, di cî de li paş xwe zivirî, lê dê û bavê ko heman pirs di çavên wan de diçurisî. "Le'net" bi pistepist got û berdeyam kir: " Ez dê çawan tiştê ko ne bi şîyan û destê min e ji we re şirove bikim. Ez we di her saetekê de kesine dîtir dibînim ko sal li pey salê bi min re mezin dibin, bi lezekê, ko her tiştê ez berê li ser we dizanim tevlihev dike". Piçekî bêdeng ma û got: " Dudiliya min du dudilî ne: Dudiliya min bi min û dudiliya min bi we. De ka em herdu vê bareyê bi hev re bipejirînin, ji ber ko wext pir hindik maye, temaşe bikin, belkî esrê ez bibim sih salî û êvarê ez bibim çel salî û bi şevê?.. Ez nizanim. Yabo, gelek tişt hene dive ez wan bi te re çareser bikim, her gerînek gerînek e, çî di rojekê û çî jî di bîst hezar rojan de be. Bêguman dê ji bo te pir zor be ko tu ji wan kesan re şirove bikî; kesên ko li paş dergê hewşê rawestiyane û bendewariya bersiveke piştjêrast dikin. Pirsgirêk e yabo, lewra tenê xwe ji bo wê amade bike, û dudiliya xwe di min de ji bîr bike".

Biçûktirîn birayên wî destê xwe li rehnê wî xist da ko berbi wî ve bizivire, **Bêkes** zivirî. "Ma deftera te heye? A min heye" yê biçûk got. "Ooox" **Bêkes** got, "Defter!! Hemî defterên ko li cem bavê min defterê min in", Yê biçûk peyva wî birî: "Na defterên bavê min in".

Bêkes hinekî xwe bir û anî, diyar e dê pirsên mafdar ên birayên wî dirêj bibin: " Yabo, ez dixwazim li ser tiştêkî ko ji bo min pir giring e bi te re bipeyivim" û bêyî ko gotina xwe rawestîne berbi dayika xwe ve zivirî: " Û bi te re jî dayê".

"**Xanê**" bav bang kir, xuşka wî pir bi lez, mîna ko li paş derî li wan guhdarî dikir. derbas bû. "Çi ye birayê min?" Jê pirsî. " Zaroka bibe û xwarinekê bide wan" û berdeyam kir: " Bûye dereng û hê jî nexwarine". Xuşka mele **Bênaw** hat bi pêş de, bi destê lawikê biçûk girt û yên mayî jî mîna berxine kêfxweş li ber xwe dehf dan.

Romana Şarezayên Taristanê ya ko Selim Berekat ew li ser qedera tirajedî ya gelê kurd nivîsandîye, piştî wergerandina wê bo zimanê ibrî, fransî û yewnanî, ji vê hejmarê û pê ve dê bi kurdî di Dugirê de hête weşandin.


DUGIR

DILÊ YAREKE BÊ YAR

Dûmanekê pencereya min
dişkenand, û xwe li bin
guhê min dixist, bi hêz
xwe li serê pênuşa min
digerand, nema dihişt ku bilive,
ez di cihê xwe de dimam çirîsî...!
Û min ji xwe dipirsî: Gelo çima
nema pênuşa min dinivîse...?
Çav bi hêsir, û bi xweziya hezar
beyaniyên poşman dengêkî bi
min re digot.

Ezmanê Odeyê bi xweziyan û
neçariyê dixemilî. .
Em tevde diwestiyan, ez,
dûman, Ode, şev, peyv, û
Niştimanî?
Min nema dizanîbû bi çi awayî
wê haş bikim...!
Ramanên parseka...Çav li qetek
nanê tu bivê yan nevê..
Bazdana Xortekî bi dûv Pûstekê
de..

Xwîn firoşekî keçel.
Dûmanê digot: Gerek tu derdê
min ji nivîskaran re binivîsî, ji
serok û rêbazên cihanê re
bibêjî, ji hemû zimanan re
wergerîni, tu daxwaza min bi
yekbûna, roj û hîvê re, bi tenê
bona şiyariya dengê kurd re
binivîse.



MEHMÛD EKO

Ez matmayî dimam ji derd û
kulên wê.

Gelo Niştimanî li bazarên bê
wariyê tê firotan.....!!!!?
Yan ev tiştê ku ez dibhîzim tev
de derewin...Yan tiştine dî hene
tu kes nizane ji bilî serok û
zanyarên cîhanê.!?

Bi dilekî şewat û çav bi hêsir
xwe davête dest û lepên pênûsê,
bi fixan û feryad, dilê rêwiyan
dişûtand.

- Ezez dûmana Agirê
Pêşmergeyekî ji Çolemêrgê me..

- Ez dûmana êzingekî ji
Meydana Çar Çira. me
Serê pênûsê dinav hêstran de
dihiliya, û ew jî her berdewam
bû li ser serpêhatiyên xwe,
keserek kur dikşand û bi nazî
diberda û bi ser vedikir.

- Ez dûmana Guleyeke bazdayî
ji birakujiyê. me

- Ez dûmana Çixara girtiyekî di
qurçikên hebsa Hisiçayê de.


- Ez dûmana girtiyên
nasnameyê me di Çalên Tedmur
û Mezê de..dûmana Çil Melyonê
bê semyan im..!?

Bi van gotinên giran ku çiyar
nikarin hilgirin, diavête bextê
pênûsa min, pênûs qolinc
dihatnê, vedirşiya, tîpin ber
avêtî, gotinên bê mirês, hevokî
pûç, ez û pênûsê bi ser hevde
diheliyan û dibûn di gotin
“Kurd û Kurdistan“ lê em li ber
hilma mendalekî difiriyan û
belav dibûn, û li dilê yareke bê
yar peyda dibûn.



1
Birano!
Rast e...
em kurê
Adam
û
Êvayê ne
lê...îro
ji hev
başqe
û
cida ne...
ji beroşekê
naxwin...
weke hev
li xwe
nakin...
çavên me
bi hev
bar
nabin...
êşa me
kêşa me
jan
û
xweşiyên me
silavê li hev
nakin...
zîna me
livîna mesir
ûgermiya
menahingivin hev
û
bi hev şa
nabin...
çima
em
xwe nas
nakin...!

BIRANO BES E!



REZOYÊ OSÊ

2

Birano!
talîşka berûyên xwe
bi
mizbûna Manga we
nadim...

Ez
gezwa darên xwe
bi
şêraniya xuşava we
nadim
Ez
ava çal
û
kehniyên xwe
bi ava qotîk
û şûşên we
nadim...
Ez
sîka darên Welatê
xwe
bi sîwanên ser
"pilajên" we
nadim...
Ez
bihna gul
û
geyayên xwe
bi
misk
û
emberên we
nadim...
çima
em
xwe nas
nakin...!
Li hev
nakin...!

3

Birano!
Devê şkenikan
ne
girin...



ne
tirsînin...
çima
em
xwe nas
n
akin...!

5
Bese...Birano!
Em
birane
li
hev
nakin
bila
du
camêr,
bê serêş,

me
ji
hev
cidakin...
me
ji
hev
cidakin...
me
ji
hev
cidakin...

17.12.93

darên gezogirtî
ne
birin...
çalên min jehir
nekin...
kehnîkên min
mismît
nekin...
devî
û
daristanên min
bi agir
nekin...
pîkolê li ser gul
û
geyayên min
nekin...
çima
em

xwe nas
nakin...!
4
Birano!
Bilûra min
ne
şkînin...
perda
ezmanê min
bi
dengê top
û
balefiran
ne
çirînin...
zarokên min
razane,
wan

Çîrokên "Pîrê"



1

Law!

Me
rextên
Çarta
ji
fîşekên berûyî
dagirtin,
lê...

me
bi
şilfikên
zingargirtî
êrîşên xwe
birin serî.

2

Gaca miha me
xwe
di ser çokê re

qevast,
tena wê xwiya kir..
Bizin pê kenî,
lê...
ji bîr kir
ko tîrîka wê
tim zîçe
û
tena wê
tim berçave.

3

Mijê
çiya girt
û
xwe
berda ser kumikên
spî,
lê...
"gunehên navnasan
tenê"
veşartin,
yên nenasan,
wek
hêkên qitikan
li rastê
dimînin".

4

Me
heftê salî

ne
gote kerkê xwe:

Hooo...ooş!,
lê...
dawî
kerkê heriyê
felişî.

5

Bi
salan
Me
çîroka şûjinê
ji
hev re
got,
lê...
dawî
Me
bîr, di latê de,
bi derziyê,
kola.

6

Law!
Xiltê-kor
tim
di
zikê zemînê de
dixebite,
lê...
axa
aza derdixe
ser
rûyê zemînê.

7

Zêr
di perçîçeqa qazê de
winda

dibe
lê...
" rim
di
xêşan de
winda
nabin".

8

Berû tehl e...
Neyar
wê
naxwe,
lê...
h
alet
û
hêlanên zeviyên me
pir
hêjane.

9

Qir
bi
ser
deşta me de
hat,
lê...
me
li
ber agirê serê
çiyê,
duranê ve,
xwe germ dikir.

10

Deviyên me
dibin kûmkir

û
hilma germ
da Neyar
xwe
germ bike,
lê...
qurmikên xwernûfê
besî
kozîkên me ne.

11

"Mirrêniya şeran
li
çiyê
tê,
lê...
li
deştê
gur
mihê
diberde".

12

De
razin!
Ra...zin!
Lê...
jiyan
bê
şiyarî
nabe.

22.12.93

1. Çîroka mih û bizinê çîrokeke folklorî ye. Herdu dost û hogir bûn, bi hev re diçûne çêreyê. Rojêke mihê xwe di ser cokeke re qevast, dûvê wê hate hildan, bizin kenî. Mihê pirsî, çima dikene. Bizinê got: "Min bin dûvê te dît". Mihê lê vegerand: "tirîka te tim li baniye, dawiya te tim taziye, em pê nakenin!".

2. Zargotina Kurdî bi vî rengî ye: "Gunehên mezinan wek çiyane, mij wan diveşêre. Yên biçûkan wek hêkên qitkan li rastêne, mij nagihe wan".

3. Kerkê heriyê: çîrokeke folklorî ye, ji çîrokên zaroka ye. Gava dolabrêsk diçine şikeftê, û her yekê bi serê kesekî xwe sûnd dixwe ko ne wê tir kiriye, keça pîrê bi serê dêya xwe sûnd dixwe. Wilo, guneh dikeve sukra keça "Pîrê" de, û keçik qerfên xwe pê dikin. Hevaleke wê dibêje: "Porkurê, ma ne heft birayê te wekî heft qerasha hene, tu bi serê pîra dêya xwe sund dixwî...!". Û rê pêş dike, çawa bihêle pîra dêya wê rêya wan pêş wê bike.

Piştî "Pîrê" li keça xwe mukur tê, kerikê heriyê jê re çêdike, û jê re dibêje, ko çî bi rê de bibîne, nabe lê bisekine û ji kerkê xwe re "hoş" bibêje, lê wê kerik bifelişe û ew nagihe birayên xwe.

4. Çîroka şûjinê: Mijûliyek ji mijûliyên zarokanî ye. Yek pirsê dike, yê din bersivê dide, û tim bersiv dibe pirs. Mijûliyeke pûçe, bê sûde û gotinvegerîne, tenha zarok wextê xwe pê dikujin.

5. Ev zargotin ji serpehatîkê hatiye der. Dibêjin, pêrebîk ji Zozanan dakete deşta Cizîrê, çend kulek (pez) ji xwe re peyde kirin, û bizava xwe bi wan dikir. Û gava siwarên desthilatê herêma ew lê hatin bac û bêşan jê bistînin, ne da wan û bi wan da zanîn, ji êla Ferhoyê Izêr Axa ye, û ew bac û bêşan nadin. Di vê dema giftûgoyê de, gundiyan bi serekê siwaran daye zanîn ko pîrebiyeke bê kes û bê kûse. Wilo, siwaran dev ji pîrebiyê berdan, lê ji wê weye ko ji ber navê F.I.Axa dev jê berdan, loma got: "Ez qurbano, şêr li Zozên dike mirênî, gur li deştê mihê diberde".

PENDÊN RIZYAYÎ YÊN PAYÎZÊ

NEZÎR AKAT

Tu weke kalê xemgîn, hêvî şikestî yî, tu hêz nikare xewnên te yên wendabuyî, hişê te yê matmayî bi şunda vegeŕîne. Tu kes nikare darên te yên pelweşyayî ji nuh ve hişîn bike, bi gul û çiçekên evînê bixemilîne. Çû hey kalo çû!

Lê bêhêvî nebe, tu hêjî dikarî bi diranên xwe yên ketî, goştê kewan bixwî û ava kanîyên pezkovîyan vexwî, û bîhna biharê bikişînî hundirê xwe.

Matmayîn û bêhêvîbûnê radestî me neke.

Dê were kalo!

Dê were kalo!

Bo çi tu bawer nakî!?

Mîna zarokê şevgirînê, ne derguş û ne jî hêlan te haş dîkin. Lorînên evînê digel hêsîrên dayikên piştxûz û rûterikî wendabûne. Dayikên ko serê te miz didan, bi germiya tava biharê re ketine xewa giran. Lê bi serê te sûnd dixwim ko ew xewnan nabînin. Ne mirî ne û ne jî sax in. Weke darên zivistanê, yên rût û belengaz, di şevên tarî de şaşmayî, rûmet û şerefa xwe diparêzin.

Belê kurê min, tu har û hov nebî ha! Jîyana bê evîndarî, wek xewnên şevên zivistanê ne. Lê ne rast in, derewîn in û gulfiroş in.

Erê kurê min, lingê xwe bide erdê, erda bav û kalan. Pişta xwe nede sîbera zinaran, bi sîya zinarên zexel û fenok nexape. Pişta xwe bide qurmên rehdaçikyayî û werzên nûhatî. Hêviya gulvedanên biharê, û kuvarkên glover ên ko axê diqelişînin û serê xwe derdixînin wekû zarokên bêguneh û evîntijî, li wir, belavbûyî mane. Destê xwe ji destê kalê diranketî neberde û nebe evînkuj. Ew dikar e rastiyê radestî te bike.

Tu dizanî ko sîya zinaran xweş e, lê xewa mirov tine. Di germiya havînê de sîyên zinaran, xuşîna avê, mirov hênik dîke û mirov jî agirê havîna zuha diparêze. Lê her gav zinar nîne. Erdên bê zinar qada hêviya vîna mirov e. Fêr bibe û hêviya xwe nespêre zinarên xwedî sî.

Der û dora me bi xewnfiroşan hatiye girtin. Darkuj û kevirkuji in . Jehra xwekujiyê bera laşê me didin.

Di piyalên xwina me de kevokên evînê difirînin. Bi destê me piyalên xwîna me li hev dixin û bi axîn û keservedanên me dilgeş û serxweş dibin. Di başûrê nimêjê de, ava zemzemê tev li xwîna me dikin û xurmeyên cimûqî dikin mezeya vexwarina xwîna me. Agir dibarînin.



Ax û xwîn tev li hev dibin. Jîyana xwîndarî û hêsirên zîvîn kirine para me. Em ne bi destê xwe ne. Em ketine nav çerxa dek û dolabên evînkujan. Hestîyên Ahmedê Xanî dinalin, qîrîna Feqeyê Teyran e. Evina Memo ji nav ferhenga devokên xwekujiyên me rabûye. Bekoyê Ewan bûye serkêşê vîyana me.

Xeyalên evîniyê û libên hinarên Xursê wekî hev in. Ew ji qebqeba evînfiroşan xweştir in. Ger tu hinarên Xursê tam nekî û jiyana xerzên nûgihîştî nas nekî, tu yê nizanibî evînkujî çi ye!?

Jiyana xwe di hêsirên çavên dayikên dilşikestî

de, dixwînim. Êdî defterên devoka ji min ra veneke û dîroka hunermendên xwekujiyê dubare neke.

Ma di banên xaniyê Xwedê de, êdî tu dikarî hêlînên hehecîkan bibînî? Şûna wan ji mêj ve kundan girtiye. Tu nabînî û nabihisî lê hîn jî tu li tembûra xwe dixînî.

De lêxe!

De lêxe!

Lêbelê gerek tu bizanibî ko, serdemên pêdivîyên zurnevanan ji mêj ve derbasbûne. Govendgeran ji zû de serkêşana govendê xistine destên xwe, û serî dikşînin. Tembûra te têra wan dike îro.

Bi çi navî gazî te bikim ?

Kerr u lal, xewnkuj, evînkuj, yan jî mîratgirê sêwîyan. Lê were weke ko me lihev kiribû, danîna navê xwe bispêre rûpelên dîrokê. Dîrok ne firsnaq û dilxwaz e. Ew tenê rêberê peymana hêvîyan e u em jî goveyên sosret û rêçên hunermendiya dîrokê ne.

Di qonaxa hunermendiya zîrek a xwekujîyê de, berjewendiyên min û te nebin yek

û serencama bawerîyên me hîn jî nelihvêkirina li ser serkêşanên govendê be ewê dilovanî û evîndarî tenê karibin gulebaranên xwekujîyê himbez bikin û goristanên vala bibin qada serlêdanên dayikên ruqelişî û por kişyayî.

Qibeqîba te, bi serê teyî delal, tenê te ditirsîne. Di qontara çiyê de gulvedanên biharê ne hunermendiya min û te ye. Ew şînbûn serencama hêsirên Zînê ye, gulvedanên xapandina çivîkên bilotanê ne ko bi hewala nizan e. Wek xapandina koçerê koçek, bi hêlînedana çivîka bilotanê, Govendgirtina wî ya li ber kalîna pezên candayî ne.

Di bêbextîyên şevên tarî de, di kolanên teng û dirêj de, çavsorî û bêhişî ya demên kevnare, bûye para me û lêvên me jî vexwarina kaniyên xwîne zuha bûne.

Çerxa destanên te, berberîya min û te, nikarin temên gulên biharê vekin, nikarin gîhayê hişkbûyî, ter û hişîn bikin û nikarin hêsirên çavên zuha şilbikin. Termên min û te, di nav berberîya min û te de, goristanên bê nav diafirînin û dengê hehecîkan jî xaniyên wêran koç dikin û warê goştûra ava dikin.

Di hinarkên rûyê te de, sêvên Meleyê zuha dibûn. Binêre îro jî di ser hinarkên rûyê te de, tenê, lê tenê, dilopên hêsirên bê bersiv diherikin. Diherikin û digihêjin daristanên şewîfî û fî, ên ko li bende mehrebaniya te, westiyayî û bê ber mane.

Kelogirîna te ya ko jî balafirên agirbarîn tê, wek xencera di dilê dilovan de, çikîyayî, tûj dike û brînen kevnare kor û xedar dike.

Di şaneyên rojavayê hişê te de, çiyê fîrêjên serhildanên rojhilatî nîne.

Şaneyên dîrokê, dîroka xewrevîn û malwêran, rê u rêçên xwe şaş kirine û bi qurmiçandina bejna te ya zirav ve gêj bûne. Ew ne te dibînin û ne jî min.

Ketine xewn û rewrewka belavkirina mîratên hev. Mîratên kuştina bav û kalan.

Û yê dîn, bi serxweşbûna vexwarina xwîna hev, ne ditevizin û ne jî bêhiş dikevin.

Ew hartir û hovtir dibin.

**The Kurdish Centre of
INTERNATIONAL P E N
A World Association of Writers
NAVENDA PEN A KURD
Kurdisches PEN-Zentrum e.V.**

Haydar Isik, President – Arnikastr. 34, D-82216 Maisach/Germany - Phone + Fax: 0049 (0) 8141 94247 Dr. Zaradachet Hajo, Secretary - Franzuseck 16, D-28199 Bremen/Germany - Phone+ Fax: 0049 (0) 4215577352 Medeni Ferho, Treasurer - A. Brackestraat 60, B-71950 Kraainem/Belgium - Phone: 0032 (0) 27 21 12 03 Members of the Committee: Mehmet Aktas, Prof. Cefilê Cellil

Founded by Huseyin Erdem

Bangewazî û Vexwendin

Ji bo hemû nivîskarên kurd Mêju: 09.11.1997

Gelî nivîskarên birêz,

Navenda P.E.N.a Kurd dê kongireya xwe ya salane di roja

07.02.1998an de, ji seet 10.00 heya bi seet 20.00, li bajare Berlinê

li navnîşana

**I-laus der Kulturen der Welt, John-Foster-Dulles Allee 10,
D-10557 Berlin, li dar bixe.**

Em bê sînor her nivîskarekî kurd, yê ko behweriya wî bi daxuyaniya P.E.N.a Navnetewî (P.E.N. - Charta) tê, vedixwînin vê kongireyê.

Xalên Rojevê:

1. Vekirina Kongireyê.
2. Gotinên mihvanan û silavname
3. Raporta kar û barê sala çûyî û ya darayî
4. Raportên her çar komîteyan:
 - Komîteya ji bo nivîskarên di zindanan de
 - Komîteya nivîskarên ji bo aştîyê
 - Komîteya nivîskarên jin.
 - Komîteya ji bo mafên wergerandin û zanyariya zimên
5. Dengdana li ser guhertina hin xalên rêbazê.
6. Amadekirina nûneran ji bo kongireya P.E.N.a Navnetewî ya 1998an li Helsinkîyê.
7. Peşniyar û amojgarî.

Li ser navê komîteya birêvebir
Dr. Zerdeşt Haco

Ji Weşanxaneyeya Apecê 4 kitêbên nû yên zarokan!

BI DIMILÎ Û KURMANCÎ



Ji zarokên xwe re bi kurdî bixwînin û bidin xwandin!



Navnîşana xwestinê li Swêdê:

Apec-Tryck & Förlag

Box 3318

S-163 03 Spånga/Sweden

Tel: +46 8 761 81 18

Faks: +46 8 761 24 90

E-post: apec@swipnet.se

Li Almanyayê:

Dilan KITAP-MUZIK

Brigitten str. 3

20359 - Hamburg/Deutschland

Tel: +49 40 432 906 70

Faks: +49 40 432 906 71



DUGIR *Kurdisk litteratur tidskrift*

Box 3437, S- 165 23 Hässelby - Sweden

Sîsirkê Hesinî, piştî bîst û çar salan, ji penageha zimanê erebî vedigere hêlîna zimanê xwe yê ko Selîm Berekat neşiya pê binivîsîne, lê ew wek deqeke hunerî û wek vejandina hişê dîroka cîgehekî dilovan û dilsoj, mîna ko aniha hatibe nivîsandin, û ji bo xwendevanên ko Sîsirk bi erebî nexwendine dê sermestiyeye taybet pêşkêş bike. Wexta ko em Selîm Berekat bixwînin, zaroktiya me dê ji nû ve dest bi zorbazî û desthilata xwe bike û hemî îstgehên nivîstî dê ji nû ve hilperikin laşê qonaxê û sirûdên bêrîkirina bi şewat dê li ber pêlên efsaneya nivîsandina hunerî û rasteqîn berbi hestên westiyayî ve serîşîv bibin.

Wexta ko em Selîm Berekat bixwînin, em dê hîn bibin çawan dîroka xwe bi awayekî hunerî biafirînin û çawan wê dîrokê ji destê sextekar û cambazên peyva kurdî rizgar bikin û şkestina xwe wek viyan û serhişkî û tolgirtin lê ne wek kûrekûr û dilpêşewitandin, pêşkêşî cîhanê bikin.

Selîm Berekat

Sîsirkê Hesinî



APEC